



Siyasetnasan sedema şerperestiya Tirkiyeyê diyar kir:


Kêşeya kurd navneteweyî dibe



■ Rayedarên dewleta tirk ji nişka ve bi daxuyaniyên tûj berê xwe dan Sûriyeyê. Çapemeniya tirk jî kampanyaya şer li dijî vê dewletê da destpêkirin û senaryoyên şer afirandin. Piştê hinek nivîskarên sedemên sexte afirandin, hinekan jî şik û gumana xwe anî zimên.

■ Sedema bingehîn a şerfiroşiya rayedarên tirk, di nav rêzên çend nivîskarên de xwe dide dest: Agirbesta PKK'ê li qada navneteweyî gelekî deng vedaye, bi vê yekê re cihê tevgera kurd li qada navneteweyî qewîtr bûye. Tiştê ku rayedarên dewletê hêrs dîke û wê bi ser Sûriyeyê dişîne, ev yek e. (R.3)

Azadiya **WELAT**



SAMI TAN

Şerfiroşî û kedkar

Ji bo fînansekirina şer, karistanan difiroşin, parsekiyê dikin, lê destê kurdên aşîxwaz nagirin. Ev nêzîktêdayineke sosret e. Hêjayî lêkolîna psîkologan e.

Rayedarên dewleta tirk li pişt xizan û kedkaran şerfiroşiyê dikin. Çapemeniya tirk jî ji bo ku karibe bi hêsanî xûgiyê ji dewletê bistîne, senaryoyên şer diafirîne, dixwaze gel li şer germ bike. Li gorî nûçeyên çapemeniya tirk, leşkerên tirk dikarin di demeke kurt de Sûriyeyê dagir bikin û ala xwe li ser birca Qesra Hafîz Esad daçikînin. Li gorî wan, artêşa tirk gelekî xurt e, ji ber ku ev 15 sal in li hemberî tevgera kurd şer dike, bi antreman e. Her wiha stratejîstên dewleta tirk didin zanîn ku, Sûriye nikare di şer de zêde li ber xwe bide, lewre serjimara (nifûs) wê ji çaran yekê Tirkiyeyê.

Rapora DÎE'yê ya 1997'an ku roja 8'ê kewçêrê di rojnameya Milliyetê de hatiye weşandin, fortên şerfiroşan pûç dike û kambaxiya rewşa aborî ya gelê kurd û tirk li ber çavan radixe. Amadekarê nûçeyê li ser nexşeya Tirkiyeyê nexşeya bajaran diyar kiriye û piştê jî daye zanîn ku dahatûya kîjan bajarî beramberî kîjan welatî ye. Li gorî wê nexşeyê ji bilî çend bajaran,

piraniya bajarên Tirkiye û bakurê Kurdistanê di radeya welatên xizan de ne. Li vir mirov dikare çend mînanan ji bajarên Kurdistanê bide; Agirî bi qasî Tanzanyayê, Wan bi qasî Gîneyê, Şîmex bi qasî Sudanê, Amed bi qasî Giravên Diranê Fîl, Riha bi qasî Bangladeşê û Semsûr jî bi qasî Nijeryayê dahatûyê bi dest dixwe.

Di vê nexşeyê belkî jî ji ber krîza bi Sûriyeyê re, nehatiye diyarkirin, ka çend bajar gihîştine asta wî welatî? Lewre tê zanîn ku dahatûya neteweyî ya Sûriyeyê ji Tirkiyeyê zêdetir e. Li aliyê din li piştê wê dewletê hemû dewletên ereb hene, ku bi pereyên neftê dikarin wê xwedî bikin. Lê her wekî di nûçeyên rojnameyên tirk de jî diyar bû, li piştê Tirkiyeyê ji bilî Azerbaycanê kes tune. Ew jî bi xwe hewce-darê alîkariya Tirkiyeyê ye.

Di Şerê Kendavê de Serokomarê wê demê yê Tirkiyeyê Turgut Özal gotibû: "Em ê yekê bidin, sisiyan bistînin" Lê tevî ku nekete şer jî aboriya Tirkiyeyê serobino bû. Hê jî qareqare rayedarên dewleta tirk e, ji DYA û

dewletê mîna Kuweytê dixwazin ku zerara wan tanzîm bikin. Îcar, "dewleta tirk çi dike, bi xwe dike", lewre jî nikare ji kesî tiştêkî bixwaze. Dîsa wê vegere ser kedkarên tirk û wan bişêlîne. Heke têrê neke dê karistanan wan bifiroşe pawanên (tekel) navneteweyî û wan bêkar bihêle.

Li gorî hejmarên fermî dewletê he-ta niha li şerê Kurdistanê 86 milyar dolar xerc kiriye. Ji bo fînansekirina şer, karistanan difiroşin, bazirganiya tîlyaqê dikin, diçin li DYA'yê parsekiyê dikin, lê dîsa jî destê kurdên aşîxwaz kurd nagirin.

Ev nêzîktêdayineke sosret e. Hêjayî lêkolîna psîkologan e. Hestên dagirkeriyê di nava dil û mêjiyê wan de şax vedane. Ew dikarin hemû axa Tirkiyeyê bifiroşin pawanên navneteweyî, lê xîçekê nadin kurdan. Divê karê ku niha li karistana Seka li dijî arizîkirinê (özelleştirme) li ber xwe didin, hinekî li vê rewşê bifikirin. Nexwe dê hê pir zarokên kedkaran di şer de jiyana xwe ji dest bidin û dê kezeba dayik û bavê wan bişewite.

Divê mirov bibe endamê cîhaneke bilind

HASAN HARAN

Ferhengok

avrû: haya	hêkan
azîrîn: harbûn, nesit-rîn	parbûn: bөлme işlemler
babet: mijar, mewzû	pêgermok: volta
bengî: tutku	pîvan: ölçü
çîrîndadan: daxwaza hawarê	payîn: li bendê mayîn
danêr: damezirîner	pêşandeyî: dîtarî
derbûn: çikma işlemler	pêşbazî: pêşbirkê (yarışma)
dibistana mecanî: yatılı okul	peywirdar: wezîfedar
diyarde: kirû (olgu)	rûdan: qewimîn
derdestkirin: girtin,	qertaf: dilbilgisinde ek
binçavkirin	raborî: paşeroj (geçmiş)
dozîn: ajo (güdü)	serborî: serpêhatî (serüven)
derhêner: yönetmen	sews: gêj, aqilsivik
giyanber: ruhber (canlı varlık)	şareza: zana, jîr
guncan: kapasite	şê: hespê "zer"
kumeyt: hespê "sor"	şayesandin: taswîrkirin
kever: bizina "spî"	tevbûn: toplama işlemler
kêrhatî: bisûd, feyde	vegotinbêj: anlatımcı
lasayî: zarîkirin (taklit)	veçîrandin: ji hev ve-qetandin
lijne: kurul	xelatdayîn: ödül verme
niştecîh: şênî (yerli)	xelatgir: kesê ku xelat distîne
navborî: adı geçen	zaniyarî: agahî
pispor: uzman	zîl: aj (filiz)
panav: li bilindahiyên cihê rast	
perav: kevî (sahil)	
pîstik: çermê dora	

Her awayê jiyane cîhanek e. Her cîhanek jî felsefeyek e. Ger mirov PKK'ê bi rengêkî felsefî binase, hem jiyaneke e, hem felsefeyek e, hem jî cîhanek e. Li gorî nêrîna me PKK, rastiya cîhana ku her curê tiştên erênî di xwe de dihe-wîne ye. Belê PKK cîhanek e. Ev cîhan jiyaneke bilind û birûmet e.

Gava ev jiyana ji xeyalên jar û bindestan ket, PKK li wir wekî gula ku di qerac de şîn bibe, derket holê, bû hêvî, bû baweriya bindestan û mirovahiyê. PKK bi derketina xwe, ji gelek tevger û bîrdoziyan cuda ye. Mirov nikare bi awayekî klasîk bibêje, ew li ser mercên civakî, konevanî û aborî derketiye û xwe çekiriye. Ev jî hene, lê ev kêman in. Yên ku van hêlan temam dikin hêlên felsefîk, zanistî û dîroki ne.

PKK deryayeke ramanî ye. Cîhaneke dilnî û ruhî ye. Li cihê ku mirovahî pir ketiye, PKK derketiye, bilind bûye û xurt bûye. Ew hêla ku bin ketibû rastiya mirovan bû. Mirov jî ji vê rastiye dîr ketibû. PKK jî, li cihê ku mirov ji xwe dîr ket, şîn bû. Lewma jî, her kes nikare PKK'ê nas bike. Dema mirov bixwaze PKK'ê nas bike, divê pêşî mirov hêla xwe ya ku wîndî kiriye nas bike. Dema mirov xwe dît û nas kir, wê PKK'ê jî bi hêsanî nas bike. Serokatî wiha dibê-

je: "Yê di fikra wî de mijûlbûnek tunebe, di ruhê wî de aciziyek mezin tunebe, çavên xwe berî penavan ne-de, tu hewldanek nikare wî bike rîya pêşketinê."

Yê ku bixwaze bibe endamê vê cîhana bilind, divê berî her tiştî nûjen û guherîner be. Ji hemû taybetiyên jiyana kevn bifilite û bigihêje ruhekî azad, fikreke serbixwe û kesatiyeke

Yê ku bixwaze bibe endamê vê cîhana bilind, divê berî her tiştî nûjen û guherîner be. Ji hemû taybetiyên jiyana kevn bifilite û bigihêje ruhekî azad, fikreke serbixwe û kesatiyeke nû. Lewre taybetiyên pergale yên mekanîk afirîneriyê dikujin. Lê belê cîhana bilind jî, mirovê afirîner û azad dixwaze.

nû. Lewre taybetî an jî gewşînen pergale yên mekanîk afirîneriyê dikujin. Lê belê cîhana bilind jî, mirovê afirîner û azad dixwaze.

PKK modelên ku pêk hatine bingeh nagire. Statûkoyên ku ji hêla pergale ve hatine çekirin nas neke. Di dîroka mirovahiyê de li dijî hemû tiştên ku li ber pêşveçûna mirovahiyê asteng in, bi awayekî tund şer dike.

Di vê cîhanê de mirovên xwediyê cewherên mezin hene. Di vê cîhanê de yên ketî, yên bilind, yên baş û yên nebaş hene. Di vê cîhanê de yên xwe vedîşêrin û yên xwe durist nişan di-

din hene; yên xwe dane gelê xwe û yên ku kirasê Şeytên li xwe kirine hene. Di vê cîhanê de yên ku li pey serkeftinê û yên ku ji bo berjewendiyê şexsî li benda keysa xwe sekinîne hene; yên cengawer, yên bêzirav, yên ji hemû tiştên xwe yên hêja borîna û yên ku li pey milk ketine hene. Ev hemû bi awayekî eşkere, di şerêkî aloz de ne. Ne pêwîst e ku girêdana

wan bi dijmin ve bi zanebûnî hebe. Ev dijberî di destpêka çêbûna vê cîhanê de heye. Di vê cîhanê de her dem xêzek bi ser ketiye. Ev jî xêza serokatîyê ye. Yanê xêza Zîlanê, xêza Egîd û Mazlûm e. Ya din jî xêza Şemo (Zekî) ye. Yanê ya îxanetê û ya hevalbendiya dijmin e. Vê xêzê herdem di demên teng û dijwar de xwestiye hemle bike, lê li ku serê xwe derxistiye li wir binax bûye. Serkeftina wê nûn e. Lewre ew xêza dijberê gelan e, xêza tarîkirina hêviya gelan e. Lewma jî herdem li hemberî xêza Serokatîyê têk çûye. Ev her du xêz jî bi serê xwe her yek cîhanek e. Yek cîhana bilindbûnê ye, yek jî ya binketinê ye.

Dem a ku ev cîhana bilind ji hêla vê cîhana têkçûyî û tarî ve ketiye xetereyê, parêzvanên vê cîhanê bi mîrxasiyeke mezin li hemberî wê livbaziya gemarî helwesta xwe danîne. Ji wan lehengan Mazlûm, Egîd, Zekî û Zîlan hene. Endamê vê cîhanê yên rastîn ev leheng in.

Siyasetnasan sedema şerperestiya Tirkîyeye diyar kir:

Kêşeya kurd navneteweyî dibe

Heftaya çûyî ji nişka ve rayedar û ferman-darên dewleta tirk bi daxuyaniyên tûj berê xwe da dewleta Sûriyeyê. Piştê jî kampanye şer li dijî Sûriyeyê dest pê kir. Hemû sernûçeyên rojname û televîzyonên tirk ji vî mijarê re hate veqetandin. Her wiha, piraniya qunciknivîsên Rojnameyan û şîrovekarên televîzyonan jî li ser he-man mijarê nivîsîn û diyar kirin ku êdî wexta şima-qavêtina rûyê Sûriyeyê hatiye.

Di rûpelên pêşîn ên rojnameyên rejîmperest de banga şer cih girt û stratejiyên dagirkirina Sûriyeyê hatin pêşkêşkirin. Bo nimûne Rojnameya Hürriyetê jî bo senaryoya şer, pirtûkeke ku berî salekê li Amerîkayê hatibû weşandin, bingeh girtibû. Di vî pirtûka ku ji hêla pisporên şer ên Pentagonê ve hatibû nivîsandin de, kurdan bi alîkariya Sûriyeyê bendava Bîrecikê bombe dikir. Rojnameya tirk ev senaryo wekî rastî dabû nîşan, lê di pirtûkê de tiştekî din hebû, li gorî vî pirtûkê ji ber vî bûyerê şerê cihanê yê sêyemîn derdiket.

Bi taybetî nivîskarên wekî Emin Çölaşan, Yalçın Doğan, Güneri Cıvaoglu, Zafer Mutlu, Ertuğrul Özkök, İlhan Selçuk, Hikmet Çetinkaya, Rahim Er û hwd. dan zanîn ku Tirkîyeyê tam di wextê de gurmista xwe hildaye, divê bêtirs li Sûriyeyê bide, da ku karibe encamekê bistîne.

Çima niha?

Piştî demekê hinek nivîskarên şik û gumana xwe li ser helwesta Tirkîyeyê anîn zimên. Ji ber ku bûyerê ku sedema vî helwesta dewleta tirk diyar bike, li holê nîn e. Bo nimûne Fermandarê Hêzên Avî yê Artêşa Tirk ê berê Güven Erkaya roja 7'ê mehê beşdarî bernameyê NTV'yê bû û di wir de bêbingehiya helwesta rayedarên Tirkîyeyê anî zimên. Erkaya got: "Min fêhm nekir, ka ji bo çî ji nişka ve helwesteke wiha tûj derkete holê." Fermandarê malnîşin Erkaya diyar dike ku Tirkîyeyê bi êrişeke nikare tiştekî bi dest bixe. Her wiha tevî ku tiştek li holê nîn e jî, rojnamegerên tirk piştî van daxuyaniyên tûj ên rayedarên Tirkîyeyê, hinek hincet afirandin. Li gorî hinekan Tirkîyeyê notayek dabû Sûriyeyê, tevî ku di ser re çend meh derbas bûbûn jî, Sûriyeyê tu bersiv nedabû. Hinekan jî aloziyên di nav rêveberiya Sûriyeyê de wekî sedem nîşan da.

Çapemeniya tirk bêtir çend navên awarte; çî laîk, çî îslamî, çî çepgir, çî rastgir xwe avêtin piştê dewletê. Hinek derdorên îslamî şik û gumana xwe li ser şer anî zimên, lê dîsa jî di warê bingeha kêşeyê de helwestek diyar nekirin. Li gorî senaryoya derdorên îslamî, Amerîka û Îsraîl dixwaze li başûrê Kurdistanê dewleteke kurdan bide avakirin û PKK'ê jî li wir bi cih bike. Ji ber vî yekê dixwazin bala her kesî bikişînin ser Sûriyeyê ku armanca xwe ya rastîn veşêrin. Hinek ji wan Serokê Sûriyeyê wekî ajanê Mossadê, hinekan jî wekî mason bi nav dikir. Bo nimûne nivîskarê Rojnameya Akitê M. Ahmet Varol, li aliyekî dibêje, dewleta tirk ji bo pirsirêkên xwe yê hundirîn bincil bike, pirsirêka bi Sûriyeyê re derdixe pêş, li aliyê din jî îdia dike ku Îsraîl dê li başûrê Kurdistanê piştevanîyê bide PKK'ê, Barzanî û PKK'ê li hev bîne, ji bo karibe kurdan li ser riya afirandina "Îsraîla Mezin" wekî pir bi kar bîne. Di senaryoyên derdorên îslamî de îradeya gelan tune. Jix-

Sedema rastîn di nav rêzên nivîsên hinek nivîskarên de xwe dida dest. Nivîskara Milliyetê Yasemin Çongar bi van gotinan sedema rastîn a krîzê diyar dike: "Hinek rayedarên DYA'yê di vî krîzê de rola navneteweyîbûna kêşeya kurdî ji bîr nakin. Li gorî wan PKK jî dewleta tirk hê baqiltir çalakiyên diplomatîk dimeşîne. PKK lê xebite ku bi agirbestê, riya siyasî ji xwe re veke. Ev stratejî ji gelek welatên Ewrûpayê bersiveke erênî distîne."

we heta ji wan neyê pirsîn, navê gelê kurd jî bi lêv nakin. Di senaryoyên wan de jî (wekî hinek çepgirên kemalist) gelê kurd û rêxistinên kurd pêlistikên dewletên din in. Dema tê pirsîn jî, dibêjin: "Em dixwazin mafên gelê kurd ên çandî û însanî bîr nasîn, lê em li dijî parçebûnê ne."

Îsraîl û DYA bêlayan man

Berevajî senaryoyên derdorên îslamî û hêviya mezin a nivîskarên laîkperest, Îsraîlê xwe nêzikî vî aloziyê nekir. Li gorî nûçeyên ajansên navneteweyî rayedarên Îsraîlê dane zanîn ku tu tîkiliya wan bi vî aloziyê re nîn e. Her wiha Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê jî li dijî qeyranê wiha derket û xwest ku kêşe bi riyên diplomatîk çareser bibe.

PKK di warê diplomasiyê de jêhatîtir e

Sedema rastîn di nav rêzên nivîsên hinek nivîskarên de xwe dida dest. Bo nimûne nivîskara Rojnameya Milliyetê Yasemin Çongar di nivîsa ya roja 5'ê kewçêrê de bi van gotinan hem dîtînen DYA'yê tîne zimên, hem jî sedema rastîn a helwesta Tirkîyeyê diyar dike: "Hinek rayedarên DYA'yê di vî krîzê de rola navneteweyîbûna kêşeya kurdî ji bîra xwe dernaxin. Li gorî wan PKK jî dewleta tirk hê baqiltir çalakiyên diplomatîk dimeşîne. Nasnekirina xebatên kurdên li derveyî PKK'ê, vî partiye wekî tekane nûnerê kurdan derdixe pêş. PKK'ê bi agirbesta ku roja 1'ê rezberê bi agahdarkirina Ewrûpayê îlan kir, lê dixebite ku riya siyasî ji xwe re veke. Ev stratejî ji gelek welatên Ewrûpayê bersiveke erênî distîne." Nivîskarê Hürriyetê Fatih Altaylı jî di nivîsa xwe ya roja 8'ê rezberê de daye zanîn ku tekane rêveberê kurdan ê li gorî dilê ewrûpiyan Abdullah Öcalan e. Kevnediplomatê tirk Şükrü Elekdağ jî ji mêj ve balê dikişîne ser "siyasîbûna PKK'ê". Dîsa nivîskara Milliyetê Nilgün Cerahoğlu ku rewşa kurdên li Ewrûpayê ji nêzik ve dişopîne, diyar kiriye ku kêşeya kurd dikeve heyameke nû. Cerahoğlu, bi daxuyaniyê Wezîrê Dewletê yê Tirkîyeyê Şükrü Sina Gürel dest bi nivîsa xwe kiriye. Di vî daxuyaniyê de hatiye gotin ku li Tirkîyeyê kêşeya kurd nîn e. Nivîskara Milliyetê dibêje, kêşeya kurd a ku Tirkîye lê xwedî dernakeve, hinekên din lê xwedî derdikevin. Li gorî nivîsa Nilgün Cerahoğlu piştî ku komên penaberên kurd gihîşt in qêraxên Îtalyayê, helwesta îtalyan a li hemberî kurdan guherî. Êdî rayedarên îtalî jî di nav de, gelê Îtalyayê bi çavê maxdûrên şer li kurdan dinêrin, lê ji ber ku naxwazin tîkiliyên xwe bi Tirkîyeyê re xerabtir bikin, vî yekê bi awayekî vekirî nabêjin. Li pey agahiyên ku Cerahoğlu dane, rayedarên Îtalyayê êdî kêşeya kurd, wekî kêşeya xwe dibînin û dixwazin ev kêşe çareser bibe. Ji



Nimûneyek ji senaryoyên şer ên çapemeniya tirk

ber ku Îtalya deriyê Yekîtiya Ewrûpayê ye, ev kêşe êdî bûye kêşeya hemû Ewrûpayê, lewre jî lidarxistina konferanseke navneteweyî ya Kurdistanê pêwîst tê dîtin.

Di şer de zarokên kedkaran dimirin

Her wekî ji van nîrxandinên nivîskarên tirk jî diyar dibe, agirbesta PKK'ê rê li ber navneteweyîbûna kêşeya kurd vekiriye. Di qada navneteweyî de êdî navê "terorîstiyê" ku dewleta tirk bi pey kurdan xistibû, di cih de nayê dîtin. Kurd wekî neteweyeke bindest û aştîxwaz tîne pejirandin. Ev rastî rayedarên dewleta tirk hêrs dike û bi ser Sûriyeyê de dişîne.

Her wekî bavê Üsteğmen Efgan Cengizê ku nû di şer de hatiye kuştin, dibêje: "Kurê Tansu, Demirel, wezîr û dewlemendan dixwin, vedixwin, ji xwe re digerin. Zarokên xizanan diçin di şer de tîne kuştin." Dîsa her wekî nivîskarê Rojnameya Akitê M. Emin Kazıcı dibêje, "Heta niha tu zarokên rojnamegerên navdar jî nehatine kuştin." Kesên ku di şer de tîne kuştin zarokên kedkaran in, divê ew bi virên şerxwazan nexapin, werin ser riya aştî û biratiyê.

NAVENDA NÛÇEYAN

Sazkirina bingeha Xoybûnê û Serhildana Agirî

Piştî Serhildana Şêx Seîd, rewşenbîr û şervanên kurdan li Iraq, Îran û Sûriyeyê belavbûn. Rewşenbîrên ku ji berê ve li wir bûn, Cemiyeta Millî ya Kurdan saz kiribûn, lê ev cemiyet ji aliyê rêxistinîbûnê ve lawaz bû. Di wê demê de li bakûrê Kurdistanê qetlîam çêdibûn û van bûyeran ev rewşenbîr dikirin jiyana tevgerê. Di vê navberê de biçûk bin jî berxwedanên li Bakur didomiyên.

Van rewşenbîran biryar girt ku kurdan ji bo pirsgerêka netewî kom bikin. Piştî gelek xebatan di payiza 1927'an de "Komcivîna Giştî ya Kurd" pêk hat. Bi vî awayî bingeha Xoybûnê hate avêtin û di 5'ê kewçêra 1927'an de bi yekbûna 'Kurt Teali Cemiyetî, Teşkilatî İçtimaiye,

Li gorî rêznameya Xoybûnê xala duduyan, armanca sazkirina Xoybûnê ev e: "Armanca Cemiyetê rizgarkirina kurd û Kurdistanê ku di bin destên tirkan de ye û veqetandina sînorên neteweyî".

Wekî tê dîtîn di rêznameyê de tenê rizgarkirina perçeyê Kurdistanê di bin destê Tirkiyeyê de hatiye armanckirin. Ji ber vê yekê wekî tevgerê neteweyî nayê binavkirin. Ligel vê jî Xoybûnê li gelek welat û bajarên nûnerîtiyên xwe vekirine. London, Petroit (Amerîka) Bêrûd, Parîs, Kahîre, Mûsil, Hatay (wê çaxê di bin destê Fransayê de ye), Amed. Herwiha ji bilî van tê gotin ku li Wan, Farqîn, Sêrt, Kerkûk û Silêmaniye jî nûnerîtiyên Xoybûnê hatine vekirin.

rên xwe diçe Îranê. Di sînor de naxwazin ku sîlehên xwe bidin leşkerên Îranê û di encamê de ji aliyê wan ve tên kuştin.

Di pêvajoya Serhildanê de Agirî (Bazîd) bi temamî dibe herêmeke rizgarkirî. Xoybûn li ser vî erdî fermîbûnê çêdike. Di bin ala kesk, sor û zer de jiyana xwe didomînin. Kes bêyî destûr nikare têkeve erdê wan.

Leşkerên kurd di Serhildana Agirî de ji aliyê pêdiviyên şer ve pir tengasiyê dikişînin. Ji ber ku ji tu deverê ji wan re tu alîkarî nayê. Temamê sîlehan ji leşkerên tirk ên dil tîn bidestxistin. Kurd bi van sîlehan şer di meşînin.

Serhildana Agirî bi yakîtiya dagirker û Sovyetêstanê tîk diçe. Di êrişê Îran, Rûsya û Sûriyeyê de ku li hemberî kurdan dibin yek, dînamîzma hundurîn li hemberî ya derve qels dimîne. Îhsan Nûrî Paşa li ser vê êrişê dawîn ku dibe sedeba têkçûna Serhildana Agirî wiha gotiye: "Baweriya me bi Îranê dihat, lê gava ji wî aliyê de tiving ji me re hatin, min dît ku leşkerên tirk ji aliyê Îranê de hatin û pilotên Rûsyayê jî tevî wan bûn."

Ji bo vê têkçûnê wiha tê gotin: Îhsan Nûrî Paşa ji Xoybûnê re nameyekê dişîne. Leşkerê ku vê nameyê dibe ji aliyê leşkerên tirk ve tê girtin û bi destê wan tê kuştin. Name bi dest wan dikeve. Li gorî wan di nameyê de hatiye nivîsîn ku leşkerên kurdan pir tengezar bûne, tu tiştên wan nemaye û li ber têkçûnê ne. Leşkerên tirk jî ji vê yekê hêzê digirin û bi pilotên rûs û bi alîkariya Îranê ji aliyê Îranê ve êrişî leşkerên kurdan dikin. Leşkerên tirk ji ber ku alîkariya van dewletan digirin di vê êrişê de bi ser dikevin.

Piştî vê têkçûnê Îhsan Nûrî Paşa tevî hevala xwe Yaşar Xanim diçe Îranê. Li wir li ser giliyê Tirkiyeyê çend caran tê girtin û berdan. Îhsan Nûrî Paşa di 18'ê adara 1976'an de, li Tahranê dema ji mala xwe derbasî ser rê dibe, motosikletek lê diqelibe. Ew di nexweşxaneyê de roja 25'ê adarê ji nav gelê kurd koç dike.

AMADEKAR: EVÎN RONÎ

Çavkanî: 1. Rohat Alakom-Xoybûn Örgütü ve Ağrı Ayaklanması

2. M. Kalman-Ağrı Direnişi

3. İ.N.Paşa-Ağrı Dağı İsyanı



Ji danerên Xoybûnê: Yên li piyan ji aliyê çepê ve; İsmail Hakkı Şeweş, Memduh Selim, Ali Sydo Goranî; yê rûniştî ji aliyê çepê ve Ramanlı Emin, Rağıp Beg.

Kurt Millet Fırkası û Kürt Ulusal Birliği' Cemiyeta Xoybûn hate saz kirin.

Lêsorkirina van rêxistinên ji bo pêkhatina sazkirina cemiyetê Memduh Selîm Beg kiriye. Ew bi van rêxistinên re diaxive û ji wan piştigiriyê digire. Piştî wê xebatê dîrok û cih tê diyarkirin. Kongreya Yekemîn a Xoybûnê bi beşdariya kesên ku hatine vexwendin roja 5'ê kewçêra 1927'an li Bajarê Bhamdunê yê Lubnanê li mala Keşîş Vaham pêk tê. Keşîş wê çaxê endamê Komîteya Navendî ya Rêxistina Taşnak a Ermeniyane ku di 1892'yan de hatiye saz kirin e û bi eslê xwe ji ermeniyên Agirî ye.


Li gorî vê civîna yekemîn ku li çavkaniyan de tam ne zelal e, sazkirina Xoybûnê jî di heman dîrokê de pêk tê. Her wiha ev dîrok di rêznameya Xoybûnê de jî hatiye nivîsîn.

Ji Malbata Bedirxaniyan Celadet Bedirxan wekî serokê Xoybûnê hatiye hilbijartin. Îhsan Nûrî Paşa jî ku wê di Serhildana Agirî de wekî fermandarê leşkerî yê serhildanê bê peywirdarkirin, di nava kadroyên Xoybûnê de cih digire.

Pêkhatina Serhildana Agirî

Serhildana Agirî bi kontrol û rêvebirina Xoybûnê di salên 1927-1930' yî de pêk tê. Ev dîrok ligel ku hîn jî dirêj dibe ev dema herî gur e şer e. Serhildana Agirî li Agirî û navçeyên wê bi serokatiya Îhsan Nûrî Paşa pêk tê. Her wiha di çavkaniyan de li ser lehengiya Bro-yê Heskî Têlî jî tê rawestandî ku wî jî di vê serhildanê de bi leşkerên xwe ve şerekî mezin meşandiye. Bro-yê Heskî Têlî di dema têkçûna Serhildana Agirî de tevî 300 leşke-

İHSAN NÛRÎ PAŞA KÎ YE ÇAWA KET NAV TEVGERA KURDISTANÊ



İhsan Nûrî Paşa di sala 1893'yan de li Bedlîsê tê dinê. Piştî ku xwendina xwe ya seretayî li vir diqedîne li Erzînganê Dibistana Rûştiye ya Leşkerî dixwîne, piştî wê li Stenbolê di Dibistana Cengê de tê perwerdekirin. Wekî Teymen beşdarî nav hêzên Osmanîyan dibe. Di dema Şerê Cihanê yê Yekemîn de birîndar dibe. Wî tînin Erzînganê jî bo tedawiyê. Piştî ku tedawiya wî xilas dibe wî dişînin "9. Ordu Bölgesi". Piştî rawestîna Şerê Cihanê yê Yekemîn bi "Kurdistan Teali Cemiyetî" ya li Stenbolê re dikeve tîkiliyê. Di sala 1919'an de di nav rêxistinêke ku li dijî rêveberiya navendî ya Osmanîyan tevdigere de cih digire û sekreteriya wê komîteyê digire ser xwe. Dûre xwe wekî fermandarê alayê îlan dike. Piştî wê wekî fermandarê alaya 91'ê girêdayî artêşa 9 an tevdigere. Gava ku gumana dagirkirina Stenbolê dikeve rojevê ew diçe Bedlîsê. Piştî wê wî dişînin Bakûyê. Di Şerê Çaldîranê de serokatiyê dike. Piştî wê wî bo serokatiya yekîneyên li Bişêriya dişînin Batmanê. Ew li vir jî bo rizgarkirina Kurdistanê bi serbazên kurd re dikeve nava tîkiliyan. Di vê demê de bûyera Şêx Seîd dibihîse. Bi dizî diçe Xoyê. Di dema serhildanên li derdora Agirî de Îhsan Nûrî Paşa tevî 20 leşkerên xwe jî bo ku propagandaya çekdarî û rêxistinîbûnê bidin destpêkirin ji aliyê Cemiyeta Xoybûnê ve tê peywirdarkirin. Piştî xebata li Erzîromê, dîsa ji aliyê Cemiyeta Xoybûnê ve ji bo Serhildana Agirî wekî serleşker tê tayinkirin.

Rêzîmanê kurmancî

- Wane 33 -

SAMÎ BERBANG

Di lêkeran de neyinî

Di lêkeran de sê awa hene; erênî, neyinî, pîrs. Dema di hevokê de encameke erênî hebe, lêker erênî ye, lê dema di hevokê de kar bi awayekî erênî neçe serî wê gavê awayê lêkerê neyinî ye. Di lêkeran de neyinî bi alîkariya hin qertafan pêk tê. Ji van qertafan re qertafên neyinî tê gotin. Ev qertaf tê ber lêkeran û bi lêkeran ve tê nivîsandin. Hin kes van qertafan wekî "daçek" bi nav dikin, lê bi dîtina me ev ne daçek in, lewre daçek di kurdî de bi serê xwe tene nivîsandin û bi vî awayî bi peyvên berî û piştî xwe ve nabin. Hinek kes jî wan wekî paşgir û pêşgir dibînin, lê ev dîtina jî ne di cihê xwe de ye. Her çiqas di hin peyvên wekî nexweş, nemir de qertafa neyinî pêşgir be jî, lê qertafên ku tên ber lêkeran ne pêşgir in. Lewre ev qertaf di wateya lêkerê de tu tiştî naguherîne, bi tenê wateyeke neyinî dide wê. Ji ber vê yekê divê ew wekî qertafê neyinî bê pejirandin û li ser wan bê rawestandin. Dirûvê qertafên neyinî li gorî deman diguhere. Lê hin lêkerên awarte hene

ku qertafên wan ên neyinî li gorî demê naguhere. Mirov dikare, ji bo wan lêkerên awarte ku hejmara wan gelekî kême, lêkerên karin/kanîn, zanîn û wêrîn bide.

Qertafa neyinî ya lêkerên karin û zanîn /ni-/ ye.

Ez nikarim werim.

Min nikaribû bibêjim.

Em nizanin kar bikin.

Hûn ê nizanibin bixwînin.

Min dê nizanibûya bihejmêrim.

Di dema boriya têdeyî û dudar de qertafa neyinî ya van lêkeran /ne-/ ye.

Min nekarî çareser bikim.

Min nezanî ku ew wisa ye.

Wî nekariye xwe bigihîne te.

Wan riya mala we nezanîne.

Di dema niha de ji bilî çend peyvên awarte ku me li jor çêlî wan kir, qertafa neyinî /na-/ ye.

Ez naxwazim te bibînim.

Tu naçî wê derê.

Ew nameyê naşînin.

Em nakevin erdê.

Hûn natirsin.

Ew xwe nadin ber xebatê.

Di dem û raweyên din de qertafa neyinî /ne-/ ye. Mirov dikare çend mînakên jî li ser vê demê bide.

Ez ê neçim gund.

Min tişteke negot.

Wî heval nedîtine.

Tu ji mal derneketibûyî.

Wî yê ji te nexwesta.

Hûn neçûbûn wê derê.

Wan diviya wî neşanda.

Heke me nedîta.

Heke em rojnameyekê nestînin.

Raweya fermañ

Li ser qertafa neyinî ya raweya fermañî dubendî heye. Birek zimanzanê kurdî di din zanîn ku qertafa neyinî ya vê raweyê jî /ne-/ ye. Ji ber ku di nav wan kesan de danderên alfabe û rêzîmanê kurdî Celadet Bedirxan jî heye. Di zimanzanê nivîskî de bi giranî wisa jî cih girtiye. Lê, li gelek deverên Kurdistanê di nav gel de qertafa neyinî ya vê raweyê wekî /me-/ tê bikaranîn. Ji ber vê yekê hinek zimanzan li dijî boçûna serdest derdikevin û di nivîsên xwe de wekî qertafa

neyinî /me-/ yê bi kar tînin. Li gorî dîtina me jî qertafa neyinî ya raweya fermañî /me-/ ye. Ji ber ku di nava gel de bi berfirehî /me-/ tê bikaranîn û her wiha jî di zaravayên din ên kurdî (kirmancî û kurmancî ya jêrîn) de jî qertafa neyinî ya raweya fermañî /me-/ ye, heke wisa bê bikaranînê de çêtir bibe.

Heval zû meçe.

Keko tev medin.

Hêdî mexwin.

Heval wisa merêse.

Lo lawo tu meke, meleziñe!

Fêkiyên ku min anîne mexwin.

Derî ji kesi re vemeke!

Di dawîya vê mijarê de divê em li ser taybetiyê lêkerên ku ji pêşgiran pêkhatine, rawestin. Her wekî berê jî hate diyarkirin di van lêkeran de qertafa neyinî jî wekî qertafa dema niha /di-/yê dikeve navbera pêşgir û lêkera resen. Em dikarin çend mînakên li ser vê yekê jî bidin.

Min av venedixwar.

Wî ez ranekirim.

Ew hilnekişîyan.

Em ranawestin.

We lampe vênexist.

Min kakilê mijarê venegot.

Min wêne dernexist.

"Hemû rê derdikevin Romayê"

NEJDET BULDAN



Ev gotina li jor ne ya min e. Gotineke kevne. Ji dema Împaratoriya Romayê tê. Wê demê Împaratoriya Romayê, ji Îskandînavan bigire, heya Mezopotamya û gelek deverên dinyayê xistibûn bin destê xwe. Îro li şûna wê desthilatdariyê bi tenê berhemên dîrokî yên wekî rê, qesr, xîmên bajar, pîran û yên dîtir mane.

Belê careke din Roma hate rojevê. Vê carê bi civîna PKDW'ê. Em li ser teknîk û bûyerên Romayê nasekinin. Ji ber ku di çapemeniya tirk de bûyer bûbû sernûçe. Lê pêwîst e em li ser naveroka vê civînê bisekinin.

Careke din jî PKDW'ê civîna xwe ya giştî li Romayê çêkiribû. Bi rastî hingî jî pêşwaziyê fermî hatibû kirin. Lê bandora dewleta tirk a li ser çapemeniya wan nehişt ku ev bûyer bê fêmkirin. Koçberiya kurdan, biryarên Parlamentoya Ewropayê, agirbesta PKK'ê, peymanên li Washingtonê ya di navbera PDK û YNK'ê de hate girêdan, dîplomasiya kurd û rewşa têkoşîna gelê kurd

bû sedemeke mezin. Ev gişt hatin ser hev û ew qiyamet (!) rabû. Sedema bilindbûna vê bûyerê yek jî ev bû ku dewleta tirk gelek gef û axaftinên hişk li dijî Îtalyayê kirin. Wekî hemû caran hesab dikir ku bi gefan ev civîn bête rawestandin. Lê mixabin(!) hemû çalakîyên dewleta tirk dibûne sedema bersivên demokratîk.

Partiyên Îtalyayê yên desthilatdar û dijber endamên PKDW'ê pêşwazî kirin. Li parlamento û belediyeyên Romayê avahiyên xwe dane xizmeta vê civînê. Xwarin, civîn û civînên çapemeniyê bi kurdan hatin çêkirin. Civîneke taybet ku rojeva wê rewşa Kurdistanê û çareserkirina pirsgirêka kurd e, hate lidarxistin. Parlementerên îtalyanî û dostên din ên kurdan, ji kurdan bêhtir axivîn.

Di vê civîna bi rojeva taybet de du xalên girîng hebûn.

Yek nasandina PKDW'ê û di qada navneteweyî de danpejirandina wê bû. Li ser vê xalê biryar hate girtin ku komîsyoneke ji hinek endamên her du parlamentoyan pêkhatî, bête avakirin. Endamên parlamentoya Rûsyayê jî Komîsyona Jeopolîtîk jî amade bûn û wan jî piştgirtina vê pêşniyarê kir.

Du, ji bo çêkirin konferanseke navneteweyî ya kurdan xebat bê meşandin. Biryara wê jî hate standin ku bi harîkariya dostên Îtalî di sazîyên navneteweyî û Neteweyên Yekbûyî de gelê kurd bête

naskirin û temsîlkirin.

Encama herî balkêş jî ew bû ku Parlamentoya Îtalyayê biryarek stand û bi daxuyaniyekê ew belav kir. Di vê biryarê de jî xalên girîng ev bûn:

Pirsgirînga kurd bi riya siyasî bête çareserkirin. Sîstemek federatîf û mafên kurdan li hemû parçeyên Kurdistanê bêne parastin. Bersiv bo agirbestê bê dayîn. Mercên îro bo temsîla kurdan girîng tê girtin, ji bo vê yekê jî PDKW di qada navneteweyî de bi nûnerîtiya kurdan tê nasîn.

Civîna Romayê bi kurtî ev bû. Parlementerên dost ên Rûsî Kibrişî, Yewnan û Filistinî jî beşdarî van civîn û biryaran bûn. Rojname û televîzyonên Ewropayê cihekî gelek mezin dane vê civînê. Di navbera dewleta tirk û Îtalyayê de ev civîn bû sedema aloziyên diplomatîk û heştê jî ev alozî berdewam in. Roma bû mîna keke gelek baş ji bo Ewropîyan. Ev civîn bû av û agir kete bedena dewleta tirk. Bingeha aloziya di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de jî ev civîn heye. Îro careke din dagirkirina başûrê Kurdistanê hatiye rojeva tirkan. Li Parlamentoya Ewropayê raporên li ser rewşa kurdan ketine rêzê.

Bêguman gotina me ya li jor di cih de ye. Diyar çavan ev e ku gelek rê di Romayê re derbas dibin.

Wan zarokatiya min ji min stand lê, Ez xortaniya xwe nadim wan

Di sala 1991'ê de li herêma Amed, Çewlik û Gimgimê dewleta Tirk operasyoneke mezin li dar dixe. Di wê operasyonê de fermandarê yekîneya wan Aslan şehîd dikeve û Elî jî birîndar dibe. Elî, bi awayekî birîn xedar xwe digihîne gundekî. Ji ber vê yekê gundî dixwazin wî bibine doxtor û didin ser rîya Amedê. Dema ku gundî Elî bi traktorê dibin Amedê, di rê de li leşkeran rast tên. Leşker gava ku lêgerînê dikin, lingê Elî yê birîndar dibînin. Leşker yekser Elî dibine Amedê û piştî lêpîrsîneke kurt wî dişînin Şaxa Têkoşîna li Dijî Terorê ya Diyarbekirê (Diyarbakır Terörle Mücadele Şubesi). Gava ku Elî dibine TMSŞ ya Amedê, lêpîrsîna wî ji aliyê îtirafkar Alaatin Kanat û Hidayet Bozyiğit ve tê kirin. Van her du îtirafkaran Elî di nava gerîla de

Elî piştî şerekî giran, bi birîndarî xwe digihîne gundekî. Gundî dikin wî bi erebeyê bibin nexweşxaneyê lê leşkerên tirk, di dema lêgerînê de lingên wî dibînin û yekser wî derdest dikin.

Piştî ji bo lêpîrsînê wî dişînin cem îtirafkarên wekî Alattin Kanat û Hidayet Bozyiğit. Her du îtirafkaran Elî di nava gerîla de nas kiribû. Tevî ku Elî birîn xedar e jî, îşkenceyên giran lê têne kirin lê ew dîsa jî li ber xwe dide. Peyre jî bo ku ditirsin dê li lingê wî kangren peyda bibe, Elî dişînin Girtîgeha Amedê.



nas kiribû. Elî 30 rojî di destê wan celandan de dimîne û bi wê bedana xwe ya biçûk û birîndar, li hemberî îşkenceyên xedar û giran li ber xwe dide. Elî, serpêhatiyên xwe yên wê demê wiha dianî zimên: "Ez 30 rojan binçav de mam. Digotîne min cihê hevalên xwe bêje lê min nedigot. Ji ber vê yekê jî hemû cureyên îşkenceyê li ser min diceribandî lê ez li hevalê xwe difikirîm, ez li rewşa îtirafkaran difikirîm. Ew tiştê ku wan ji min dixwest min qebûl nedikir. Piştî sih rojan, ji ber ku lingê min birîndar wê kangren lê peyda bûbûya, dest ji îşkenceyan kişand û ez avêtime girtîgehê."

Elî di Zindana Amedê de bi Yılmaz UZUN û Rıza ALTUN re dimîne. Ev kes tesîreke mezin li Elî dikin. Ji ber vê yekê şahadeta Yılmaz UZUN tesîreke mezin li Elî dike.

Elî, salekê li Zindana Amedê dimîne. Piştî salekê wî sirgûnî Zindana Dîlûkê (Enteb) dikin. Elî

heta ku diçe Zindana Dîlûkê jî, hê bi zimanê tirkî nizane, lewre li wê derê dest bi perwerdehiya bi zimanê tirkî dike. Di Zindana Dîlûkê de Elî û Sabri Ok li heman qawîşê dimînin. Cezayê Elî li Zindana Dîlûkê diyar dibe. Elî roja ku ceza xwariye, bi van gotinan bi birîndarî: "Ji ber ku emre min biçûk bû, min bawer nedikir ku ez dê ceza bixwim. Jixwe wextê ez dibirime dadgehê, ji ber ku min bi tirkî nedizani, min ji gotinên dadger (hakim) tiştêk fêhm nedikir. Paşê ez dianîme zindanê, hevalan îdfanname dixwend û ji min re eşkere dikirin. Carekê ez dîsa biribûm dadgehê. Piştî darizandinê, cardin ez anîme zindanê. Min dît ku hevalê Sabri ji min re dibêje: "Te heft sal ceza xwariye." Li ser vê min kire qêrîn, min got: "Çima wisa bû! Min bizaniya min ceza xwariye min ê slogan biqiriyana!" Elî li dora sê salan jî li Zindana Dîlûkê dimîne, piştî sê

Di nava gerîla de cihê "portatîfan" taybet e. Dema ew li civatê hebin, dembûhêrka gerîlayan bi wan germ dibe. Ew "şêrînen ber dilê gerîla" ne. Bêguman Elî yek ji "portatîfên" herî navdar e.

salan wê carê jî wî sirgûnî Zindana Aydınê dikin. Li Zindana Aydınê rojên Elî pir dijwar û zehmet derbas dibin, her saetek jê re mîna rojekî tê, her rojek mîna salekê tê. Elî sê salan deqîqe deqîqe, saet bi saet, roj bi roj dihejmêre, ta ku sê salan dibe serî.

Dilê Elî her dem bi agirê azadiyê dişewitî, girêdana wî ya bi Partiyê re, bi hevalên xwe re, bi şehîdan re, bi her awayî xuya dikir. Her çiqas ew di zindanê de bû jî, dilê wî her dem bi gerîlayan re bû. Her tim li benda wê rojê bû ku ji zindanê derkeve û carekê here bigihêje refên gerîlayan.

Heft salên Elî bi wê bawerî û hesreta mezin derbas dibin. Roja dawî, Elî xatir ji hevalên xwe dixwaze, soz û peyman dide hevalên xwe, hevalên wî jî bi hêvî û baweriyê mezin wî bi rê dikin. Dema Elî tê ber deriyê zindanê, leşkerên dijmin carekê wî hildidin binçav. Di binçav de tenê daxwazeke dijmin ji Elî heye, wan gotiyê: "Ji Serokê xwe re bide çêran (sixêf) em ê te berdî!" Lê dikin Elî bikujin, Elî dîsa jî çêran nake. Li ser vê yekê îşkenceyên xedar û giran li wî dikin. Lê dîsa jî nikarin doza xwe bibin serî û ji neçarî Elî serbest berdidin.

Elî piştî heft salan ji zindanê derdikeve, nêzikî du mehan li îzmîrê dimîne. Rojên li Îzmîrê jî ji Elî re wekî rojên zindanê dijwar û giran dihatin. Elî digot: "Dijmin zaroktiya min ji min stand lê ez xortaniya xwe nadim wan." Piştî du mehan ew gihîşt doz û armanca xwe û kete nav refên bazên azadiyê.

(Qediya)

DAVUT ÖZALP

□ 11 kewçêr 1993:

NÇM II Edeneşê vebû

Navenda Çanda Mezopotamyayê şaxê xwe li Edeneşê vekir. Ligel pir pest û kotekişên polîsên dewleta tirk xebatên xwe didomîne. Bi hinceta ku derdora xwe aciz dike salona wê ya çalakîyan niha morkirî ye.

Niha wekî komên muzîkê Koma Rewşen, Koma Medya, Koma Sarya, Koma Şitlên Azadî (ya zarokan) a tyatroşê Koma Yekbûn, a folklorê Koma Raperîn di sê beşan de 6 komên wê hene.

BUYERINE JI DIROKE




□ 12.10.1993:

Osman Sebrî çû ser dilovaniya xwe

Osman Sebrî di sala 1905'an de li nahiyeya Narincê ya Bajare Semsûrê hatiye dinê. Piştî Serhildana Şêx Seîd, derbasî başûrê biçûk dibe. Ew li her çar aliyên Kurdistanê digere, 18 caran tê girtin û bi salan di girtîgehên de dimîne. Di Hawar û Roja Nû de dixebite. Bi navê 'Apo' û 'Bahoz' û çend nivîsên din' diwana helbestan, pirtûka li ser zimên 'Derdê me' û ya bi navê 'Çar Leheng' çar berhemên wî hatine weşandin. Osman Sebrî di 12'ê kewçêra 1993'an de li Şamê diçe ser dilovaniya xwe.

Sînemaya herî baş rastiyê tîne zimên



Dewletên dagirker, serkeftin an jî, tîkçûnên xwe cara pêşin di warê hunerê de tînin zimên. Carinan jî dixwazin tîkçûnên xwe bi riya hunerê, bi taybetî jî, bi riya hunera pêşandeyî xef bikin. Mixabin di wî warê de zaf caran jî, bi ser dikevin. Di vê mijarê de mînak herî berbiçav mirov di şerê navbera Dewletên Yekbûyî yên Amerîka (DYA) û Vîetnamê de dibîne.

DYA wekî hêzên xwe yê leşkerî û aborî, hêzên xwe yê hunerî jî xiste dewrê û bi fermana Pentagonê sînemaya DYA'yê, ya "navdar" Hollywood kete nav tevgerê. Ji aliyekî ve firokeyên DYA'yê Vîetnam bombabaran dikir, ji aliyê din ve jî, sînemavanên Hollywoodê serkeftina xeyalî ya DYA'yê, derdixist ser perdeya spî û bi vê raya giştî ya cihanê dixapand...

Hollywoodê heta dawiyê, alîkariya Pentagonê kir

Şerê di navbera DYA û Vîetnamê de ku bi temamî 10 salan kişand, rûyê Hollywoodê nîşan da. Pentagonê, Hollywood heta dawiyê xist bin pawana (tekel) xwe û nehişt ku filmên li ser rastiya şer bînin kişandin. Rast e li ser şerê ku bi milyon mirov tê de jiyana xwe jî dest da de gelek film hatin kişandin, lê belê ji rastiya şer gelek dûr bûn û wan tîkçûna DYA'yê wekî serkeftinekê nîşan dida. Wekî mînak filmê Ted Kotcheff a bi navê "Tîpa Wêrekan", filmê George Pan ê bi navê "Rambo", filmê John Irvin ê bi navê "Gîra Hamburger", filmê Oliver Stone yê

bi navê "Mûfreze", filmê Lionel Chetwynd ê bi navê "Hanoi Hilton". Mirov dikare vê listeyê hîn jî dirêj bike...

Ji xeynî çend filman ên mayî giş di vê rewşê de bûn... Gelo Hollywooda kedkar a ku gelek kedkar gihandiyê û bi hezaran film kişandine çima ev helwesta neyînî girt? Pêwîst e em li ser vê mijarê bisekinin. Ji ber ku Hollywoodê bi berçavka Pentagonê li şerê Vîetnamê dinê.

Heman tişt jî bo sînemaya Tirkîyeyê ku jê rê dibêjin "Sînemaya Yeşilçam"ê jî, rast e. Yeşilçamê, li ser şerê ku ev 15 sal in li çiyayên Kurdistanê tê meşandin, heta niha ne berhemeke pozîtîf, ne jî negatîf nîşan daye... Ji ber ku Yeşilçam ji Hollywoodê tirsonektir e ew yek qewimî. Ger Yeşilçam helwesta xwe wisa bidomîne, rewşa wê jî dê ji Hollywoodê ne cudatir be. Van salên dawî di Yeşilçamê de çalakbûnekê tê ditin, hêviya me ew e ku ev ne bi destê MGK'ê çêbibin. Ji ber ku di wî şerê dawîya sedsalan bîsttan de MGK'ê, heta niha tiştekî qenc nekiriye...


Pêwîst e alternatîfa me jî hebe

Wekî her tiştî di warê sînemayê de jî, pêwîst e alternatîfê me hebe. Ji ber ku di wî şerê dijwar de herî zêde me xwîna xwe rijand û heqê me ye ku di çerçova rastiya şer de hin filmên kurdan jî, werin kişandin. Ji bona vê jî, barê herî giran dikeve ser milê rejîsor û sînemavanên kurdan...

PERWER BENGÎ

ÇAVDÊRÎ

Apê Osman Sebrî



MÎRHEM YÎÇÎT

Wêşanxaneya Apec yek ji çend berhemdartirîn wêşanxaneyên kurdî ye li derveyî welat. Berpirsiyar û xwedişê wê Ali Çiftçi, kurdekî Anatoliya Navîn e û heta tu bêjî bi hiş û fikreke neteweyî jî bo edebiyat û zimanê kurdî xizmetê dike. Heta niha zêdeyî 100 berhemên Apecê bi sê zaravayên kurdî û bi çend zimanan gihîştine destên xwendevanên kurd û ne kurd. Di dawîya meha buhurî de Apec li hejmara listeya kitêbên xwe yeke din zêde kir. Ev jî helbestên Apê Osman Sebrî ne ku di kitêbekê de hatine komkirin û bi çapeke sipehî dikeve ser riya kitêbxaneyên kurdî.

Roja yazdehê vê mehê jî Apec, ji bo bîranîna Apê Osman û pêşkêşkirina berhema nû civînekê li dar dixê. Em ji gotar û hevpeyvînên cur be cur ên çapemeniya kurd ne gelekî fireh û kûr be jî li ser jiyana û fikrên Apê Osman Sebrî xwedişê hinek agahî ne. Em zanin kengî û li ku çêbûye, çend caran hatiye girtin û ew xwedişê şexsiyeteke çilo û çawa bû. Apê Osman kurê malbateke dewlemend û xwedimilk e. Li gundê Narincê li herêma Semsûrê jî diya xwe bûye. Di hevpeyvîn û gotarên li ser jiyana xwe de, ew ji bo sala ji dayikbûna xwe sala 1905'an dide.

Malbata wî mîna gelek malmezînan Kurdistanê dikeve ber şapa dewletê, du apên wî Şukrî û Nûrî jî aliyê dewletê ve hatine dar vekirin. Malbat gelekî diêşe û zerar û ziyarên mezin dibîne. Ev jî yek ji wan sebeban e ku Apê Osman Sebrî hê di temenekî biçûk de hez ji dewletê neke û jê bi dûr bikeve. Bidarvekirinên 1925'an û çend mehekî mana di zîndanê de, dijminayetiya navbera wî û dewletê mezin dike û fikra ku divê derkeve derveyî welat li cem xwurt dike.

Sala 1929'an dadikeve Başûrê Biçûk û heta wefata xwe li wir dijî. Li Şamê çavên xwe digire, diçe ser heqîya xwe. Sal 1993 û jî mehan jî çirî bi navekî din kewçêr e. Di van salan de ku li bîniya xetê ye, dibe Endamê Partiya Xoybûnê, ji Kovara Hawarê re dinivîsîne û mîna şexsiyeteke radîkal dikeve nav siyasetê. Ji bo ku alîkariya şoreşa Araratê bike bi komek hevalên xwe re hildikişe wî aliyê xetê. Demekê diçe başûrê Kurdistanê û Barzanî û serokatiya wî jî nêzik de nas dike, ev serokayetiya çawa ye, çendî neteweyî ye û çendî na, bi çavên xwe dibîne. Careke din di van salan de û berî ku dakeve bîniya Xetê jî carekê li Bakur, bi dehan car dikeve zindanan, sirgûn dibe Medagaskarê û heta henasa dawî şert û dijwarî çî dibin bila bibin, jiyana çendî bi serê û teşqeke dibe bila bibe, ji ser a xwe nayê xwarê, baweriya xwe bi serxwebûn û rizgarbûna gelê kurd diparêze û rewş û pergala li welêt dişopîne.

Apê Osman newestiya, dudilî nebû, morala wî baş bû. Ne kelemçe û hucreyên dagirker û neyarên û ne jî destengî û belengaziya madî, çogên wî nefizandin û ew nebîrin secdê ji zordar û desthelatdaran re. Salên dawî ew bû piştgirekî temamê şoreşa PKK'ê û hevduûdîtinên wî bi Serokayetiya Neteweyî re rengê periyodîk girt. Kurt û jin ji roja ku xwe nas dike, dijmin nas dike û pê de, rêça berxwedanê digire û careke din hew berdide. Dijberî û nelibarî pê nikarin û bi seriyekî bilind, eniyêke vekirî, wijdanekî pak, serê xwe datîne, diçe gorê. Bila serê malbat û gelê wî sax be.

Lêkolîner Rohat Alakom

Divê em xwe bigihînin sango

Birêz Alakom, heta niha we li ser babetên cur bi cur kar kiriye. Lê belê vê dawiyê lêkolîner we zêdetir li ser dîroka kurdan a nêzik tî amade kirin. Çima ne dîroka kevnare ya kurdan?

□ Rewşa dîroka kurdan angorî wela-tên din bûye hedefa çend tehlûkeyên mezin. Ji van tehlûkeyan ya herî mezin, bêguman înkarkirina vê dîrokê ye. Di vî warî de êrîşeke desînforsasyonê ya sîs-tematîk li hemberî dîroka kurdan heye. Hêz, dezgehên dewletê û yên nîv dewle-tî ji bo vê yekê hewldayînen mezin nî-şan didin.

Li aliyê din dîrokzanên kurdan ên profesyonel û şareza, bi taybetî ji nav kurdên Tirkîyeyê demeketin. Baldariya li ser dîrokê bi qasî ez pê dizanim gele-kî kême. Çend xebat û hewldayînen ku hene ji bêhtir li ser dewrên Berî Îsa an

ji Piştî Mîladê ne. Dema behsa dîrokê tê kirin, zêdetir ev dîroka Berî Îsa, binyata kurdan û babetên mîtolojîk tî famkirin. Mîrov nikare dîrokê di nav sînorên teng de asê bihêle. Tiştêkî ku duh bûye, êdî dibe dîrok. Dîrok meşeke bêdawî ye.

Çima dîroka kurdan ya nêzik? Bersî-va vê pîrsê gelekî hêsan e. Belge û do-kûmentên ku dikarin alîkariya ronahîbû-na dîroka kurdan bikin, îro malên me ne, malên cînarên me, malên hevalên me ne. Îro di her maleke kurd û ne kurd de, ji sedî sed der heqê dîroka kurdan de tiş-tek heye. Ev belge û dokûment divê ben berhevkerin, divê serpêhatiyên mirovan derbasî ser kaxîzê bibin. Eger em îro vî karî nekin, sibê ew kes dikarin ji nav me bar bikin, herin cihekî din an jî bimirin. Ez her tim dibêjim, niha jî dubare dikim: Dîroka kurdan di nav şewate (yangin) û êgir de ye. Werin em tiştêkî ji vî agirî xelas bikin. Dema zêde wexta me çêbû,

wê wextê jî em ji bo xebatên dewrên dî-roka kevn veqetînin. Bi taybetî dîroka kurdan a vê sedsala dawîn gelekî girîng e. Sedsaleke dînamîk e û bi hezaran bû-yer û diyardeyan di nava vê sedsalê de rû dane. Şahîdên van bûyeran, newiyên wan û vegotinbêjên van bûyeran di nav me de ne. Divê em xwe bigihînin wan û her wiha albûm û sangoçên wan.

Baş e. Di netewebûna gelan de rola zanista dîroknivîsîne çî ye?

□ Milletekî wekî kurdan eger naxwa-ze wînda bibe, pêwîst e bizanibe ku du tişt jê re lazim in. Yek jî wan ziman e, yek jî dîrok e. Ev herdu babet du stûnen bingehîn in, ku milletekî li ser piyan di-hêlin. Milletekî bêziman, bêdîrok nabe millet. Mirovên milletekî bi dîroka xwe serbilind dibin, xwe rehet û emîn dihesi-bînin. Dîrok, neynikeke gelekî girîng e. Mîrov ne tenê xwe, bav û kalên xwe jî,

serborî û maceraya xwe jî tê de dibîne.


Milletekî wekî kurdan wisa bîndest divê gelek "dîrokhez" be. Divê kurd bi serboriya xwe, bi dîrok û bi koka xwe ve bîndest bûn girêdan û xwe bigihînin kûrahiya însaniyete. Li vir mirov pêwîst e vê ve-cîza meşhûr dîsa dubare bike: "Mîrove-kî bi rabîhuriya xwe nizanibe, nikare pê-şeroja xwe bibîne"

Berî vê bi çend salan bi navê "Jinên Kurd- Li Kurdistanê Hêzeke Nû pirtûkeke we hate weşandin. Ji ber çî we jina kurd wekî hêzeke nû bi nav kir?

Ev xebat, lêkolîneke dîrokî bû. Çawa em dibînin, li her çar parçeyên Kurdistana nê û cîhanê jinên kurd wekî hêzeke nû di nav hişyarbûneke mezin de ne. Di her warê jiyane de kar dikin. Bi taybetî di warê politîk û çandî de tevî mêran tevdi-gerin. Jinên kurd li Rojhilata Navîn we-kî jinên herî aktif û çalak tî nasîn. Ev yeka hane gelekî bala lêkolîneran dikişî-ne. Wekî mînak tîkoşîna Leyla Zana li hemû cîhanê nav û deng daye. Ev jina kurd îro bûye nîşana azadiyê, mafên mi-rovên û nîşana tevgerên gelên bîndest. Leyla Zana heta niha bi dehan xelatên navneteweyî wergirtin. Divê gelê kurd bi hebûna jinên bi rengî serbilind bibe. Ew, bi xwe di girtîgehê de ye, her du za-rokên wê li welatên biyanî, ji dê û bavê xwe dûr mezin dibin. Bavê wan Mehdi Zana piştî ew qas salên zîndanê, welat bi welat digere û ji bo mafên mirovî tîko-şîne dide. Mîrov dikare bêje, her malba-teke kurd, wekî vê malbatê bûye hedefa zordestî, êrîş û teroreke mezin.

Dema em lê temaşê dikin, di nav tevgera neteweyî ya kurdan de li gorî tevgerên din yê Rojhilata Navîn giraniya jinan berbiçav e. Ev taybetiya jinên kurd çawa peyda bûye?

□ Jina kurd, wekî nefereke malbatê bi salan e bûye hedefa êrîşên leşkerî û şovenî. Ji ber vê rewşê, li her çar par-çeyên Kurdistanê jinên kurd mecbûr mane ku, li bal mêrên xwe cih bigirin û li dijî zordestiyê rabin. Ne tenê di warê

**KURTEJİYAN:**

✓ Rohat Alakom, di sala 1955'an de li Qersê li navçeya Qaqizmanê ji dayik bûye. Di sala 1973' an de saleke li Stenbolê li Enstîtuya Rojnamegeriyê perwerde dibe. Peyre li Zanîngeha Enqereyê Beşa Karûbarên Psikolojîk ên bo Perwerdehiyê diqedîne. Alakom, li dora 15 salan e ku li Swêdê dijî. Heta niha di gelek kovar û rojnameyan de nivîsên wî hatine weşandin. Vê dawiyê jî bi navê "Rêxistina Xoybûnê û Serhildana Agiriyê" pirtûkeke wî hate weşandin. Alakom, naveroka pirtûkên xwe yê din wiha dan xuyakirin: "Heta niha bi qasî deh pirtûkên min bi zimanên kurdî û tirkî

derçûne. Ev berhem li Swêdê, Tirkîye û li Almaniyayê derçûne. Di sala 1987'an de li Almaniyayê bi navê Serboriya Dused Saliya Kurdnasiyê pirtûkeke min hate weşandin. Bi kurtî ez li ser xebat û lêkolînen ku heta wê salê li ser kurdan hatibûn amadekirin, sekînim. Di vê pirtûkê de der heqê kur-dnasên navdar de zaniyarên (agahî) kurt hatine pêşkêş kirin. Di navbera van salan de li ser jiyana û berhemên çar şexsiyetên kurd, min çar xebatên biyografîk amade kirin. Ev şexsiyetên kurd ev kes bûn: Seidê Kurdî, Ziya Gökalp, Yaşar Kemal, Şerîf Paşa. Her sê pirtûkên min yê pêşîn li Tirkîyeyê, ya dawîn li Swêdê hate weşandin. Pirtûka li ser jiyana Şerîf Paşa vê payîzê wê bê weşandin.

Her wiha berî vê bi çend salan bi zimanê kurdî bi navê "Di Çavkaniyên Swêdî de Motîfên Kurdî" pirtûkekê min derçû. Careke din ez li vê xebata xwe vegeyriyam û niha ez carekê din amade dikim. Vê care ev pirtûk, wê bi zimanê Swêdî bê weşandin. Ji ber ku ev babeta swêdiyan jî eleqedar dike.

Dîsa babeta edebiyat û motîfên etnîkî jî ji berê de bala min dikişînin. Xwendevanên kurd ji min dipirsin: Gelo çapa nû ya "Di Edebiyata Tirkî de Temaya Kurdan (Çağdaş Türk Edebiyatında Kürtler)" wê kengê derkeve? Ev xebata ku berî vê bi çend salan çap bûbû, niha li piyasê nemaye. Ev pirtûk, divê careke din jî nû ve bê amadekirin û di ber çavan re bê derbaskirin."

Dîroka kurdan di nav şewate û êgir de ye. Werin em tiştêkî jî wî agirî xelas bikin. Dema zêde wexta me çêbû, wê wextê jî em jî bo xebatên dîroka kevn veqefînin. Bi taybetî dîroka kurdan ya vê sedsala dawîn gelekî dinamik e û bi hezaran bûyeran di nava vê sedsalê de rû dane. Şahîdên van bûyeran, newiyên wan û vegotinbêjên van bûyeran di nav me de ne. Divê em xwe bigihînin wan her wiha albûm û sandoqên wan.

qên kurdan

Îro gelek kurd xeman dixwin û dibêjin: "Em hev du fêhmakin. Dê ev rewş çawa bê guhartin?" Dema mirov li serpêhatiya gelên din temaşê dike, çawa zimanekî yekgirtî pêk anîne ango dê kurd çawa baxşê hevdu fêhm bikin?

□ Parçebûna welatê kurdan bi xwe re "parçebûna zimanî" jî pêk aniye. Ev cudahiya zimanî bêtir îradeya kurdan peyda bûne. Dema ev rewş neguhere, dê ev cudahiya zimanî her hebin.

Di wî warî de gelek kes behsa "zimanekî yekbûyî" dikin. Ev kes, danûstandina çend peyvên ji zarava û devokên din, wekî nêzîkbûna zimanê kurdî dihesibînin. Ev hewldayîn ji min re wekî xewneke xweş tê. Ev daxwazê gelekî sade û naif e.

Divê mirov çî bike? Berî her tiştî divê her zarava û devok li ser koka xwe bi pêş de here. Divê folklorê zaravayan a devkî bê berhevkirin û her wiha divê edebiyata nivîskî ya her zarava û devoka kurdî bikemile. Bedewî û îmkânên her zarav û devokê ji aliyê nivîskar, medya û lêkolîneran ve bê xuyakirin. Ji bo pêkhatîna zimanekî neteweyî an jî peydabûna zemînekê, sê tiştên girîng hene: Dewlet, sistema perwerdehiyê, medyayê ku her çar parçeyên Kurdistanê jê îstifade dikin. Kurd îro jî ji van her sê faktorên bêpar in. Dema ev îmkân peyda nebin, mirov nikare behsa zima-

polîtîk de û leşkerî de, ji aliyê orf, adet û kevneşopîyan de jî jinên kurd li ber xwe dane û ji xwe re stîleke nû ya jiyane peyda kirine. Rûçika vê jiyane ya herî balkêş, bêguman bi nisbî serbestbûna jinên kurd e.

Li aliyê din di gelek waran de jinên kurd jî jinên faris, tirk û ereb cuda dibin. Li gelek deverên Kurdistanê jinên kurd tevî mîran kar dikin, rûye xwe nagirin û xwe venaşêrin. Bi henek, laqirdî û bi ken tevî gotûbêj û nîqaşan dibin. Dema li malê tenê bin jî, jinên kurd mêvanên mîran dihewînin û wan bi edetên kurdan diezimînin.

Wekî diyar e jina kurd her wiha di warê leşkerî de jî berbiçav dibe. Gelo em dikarin bêtir tîpeke nû ya jinên kurd peyda bûye?

□ Ji bilî vê tîpa klasîk ya jina kurd, tîpeke leşkerî û polîtîk ya jinên kurd jî peyda bûye. Ev pêvajoya polîtîkbûna jinên kurd duh jî hebû, îro jî heye û ez bawer im wê heta ku jina kurd bigihêje serbestiya xwe berdewam bike. Ji ber ku zordestiya li ser kurdan, çî jin û çî mîr hemû refên civakê dike hedefa xwe. Jinên kurd gelek tiştan bi çavê serê xwe dibînin û bi guhên xwe dibihîzin. Lewre ew li ser hîvê najîn.

Vê dawiyê pirtûkêke we li ser rêxistina Xoybunê hate weşandin. Çima ne rêxistineke din bi taybetî Xoybunê?

□ Di sedsala 19'an de çend tevgerên kurdan yê millî hatine pê. Pêşengiya

van tevgeran hêzên wekî şêx, axa, beg û rûsipiyên kurd kirine. Lê belê di sedsala 20'an de piştî Serhildana Sêx Seîd, êdî rola rewşenbîr û kesên xwendez û mezînan û berbiçav bû. Metodên tekoşînê hatin guhartin. Dîplomasi, medya, propaganda, komel, rêxistin û gelek dîtinên mayîn, warên xebatê yê nû hatin tespîtkirin. Mirov dikare bi bêtir, tevgerên kurd û netewebûna kurdan modernîze bû. Rêxistina Xoybunê di sala 1927'an de li Lubnanê li ser vî bingehê û bi giyanekê wiha modern hatiye avakirin. Ji ber vî yekê Xoybunê bala min kişand. Xoybunê, di dîroka kurdan ya siyasî de nîşana modernbûnê ya herî berbiçav e. Berî avabûnê Xoybunê li Stenbolê çend rê-

Guhartinên zimanî nazenîn

nekî yekgirtî û neteweyî bike. Divê mirov di wî warî de realist be. Li aliyê din gelo akademîsyen û zimanzanên şareza li ser vî yekê çî dibêjin, divê mirov cara pêşîn li wan guhdarî bike.

Piştî ku zimanê kurdî di warê nivîskî de bi pêş de çû, li hin der û dorên kurdan dîtineke wiha peyda bû: "Ev peyv xwerû ne kurdî ye. Nexwe pê kar neke" Gelo pîvana vî yekê çî ye?

□ Li cîhanê tu ziman xwerû û "paqij" nîn in. Hemû ziman didin û distînin. Piştî demekê peyva ku ji zimanekî din hatiye standin, bûye parçeyekî tûrikê wî zimanî. Ev yek jî bo zimanê kurdî jî derbas dibe. Lê belê ji bo mîletên wekî kurdan ziman jî divê bê parastin. Ji ber ku wekî diyar e, îro hem hebûna mîletê kurd û hem jî zimanê kurdan hatiye înkâr û qedexekirin. Di rewşêke wiha taybet de mafê her kurdekî yê welatparêziyê peyda dibe û dibêje ku: "Binêre! Zimanê min heye û tîkiliya zimanê min û yê te qet tune ye. Zimanê kurdî zimanekî serbixwe ye". Di rewşêke wiha de

çawa kurdek li dijî zordestiyên polîtîk derdikeve, carinan jî li hemberî "êrîşên zimanî" jî derdikeve. Di wî warî de dema sînorên "êrîşên zimanî" baş neyên diyarkirin, wê çaxê tahlûkeyên mayîn (din) dikarin derkevin pêşiya me. Tehlûke herî mezin bi destê her kesî "icatkirina" peyvên nû yê kurdî ye. Lê gelek caran tê jibîrkirin ku, peyvên ku ji zimanên din ketine zimanê kurdî, êdî bûne parçeyekî zimanê kurdî. Mirov nikare van peyvên bi carekê re ji kurdî biavêje û zimanê kurdî jê paqij bike.

Di vî babetê de mirov dibîne, civak û ziman gelekî tesîrê li hev dikin. Ji aliyê sosyolojiya zimên de gelek tiştên balkêş hene ku divê lê bê kolandin. Rik û nefreteke polîtîk û etnîkî, gelek caran ji ber neçariyê dibe rik û nefreteke zimanî jî. Ev rastî, ji bo hemû mîletên bindest derbas dibe. Mîletên bindest her tim çareseriyên mezînan û radîkal dixwazin. Ji ber ku gelek hatine êşandin û her tim şexsiyeta wan piçûk hatiye dîtin. Nîha dor, dora wan e. Bi her awayî dixwazin xwe biparêzin û di her warî de seferber bûne. Lê belê çawa jiyana nîşanî me dide, mirov her tim bi rik û nefretê nagihêje armanca xwe. Guhartinên zimanî, ne wekî guhartinên aborî, siyasî û civakî ne. Van guhartinên mirov dikare wekî "guhartinên nazenîn" jî bi nav bike. Ji ber ku piçêkî dereng diguherin.

xistinên kurdan saz bûbûn. Lê belê ev rêxistin û komel zêdetir çandî û civakî bûn. Ev rêxistin û komel di nav sînorên Stenbolê de hatibûn saz kirin û wekî Xoybunê raste-rast di nav gel de çalakîyên xwe, tekoşîna xwe berdewam nedikirin. Lê belê rola van dezgehên ku li Stenbolê hatibûn saz kirin, di peydabûnê Xoybunê de gelekî berbiçav û bikêr e. Gelek hîmdar û avakarên van rêxistinên mecbûr mabûn, koçî bajarên Beyrûd, Şam, Helebê kiribûn. Di lê netewebûna kurdan li van navendan hildiyê. Di wî warî de rola Stenbolê piştî sala 1925'an êdî nemabû.

Di demekê nêzik de wê li ser serboriya kurdan ya Stenbolê pirtûkêke we

bê weşandin. Hûn dikarin hinekî li ser naveroka vî xebatê me agahdar bikin?

□ Stenbol di dîroka nasyonalîzma (netewepewerî) kurdî de navendeke girîng e. Nasyonalîzma kurdî ya modern cara pêşîn li Stenbolê peyda bûye. Di destpêka sedsala me de bi qasî sih hezar kurd li Stenbolê dijîyan. Îro hejmara kurdan sed qat zêdetir bûye û gihîştîye 3 milyonan. Mirov dikare bi bêtir ku bajarê kurdan ê herî mezin li cîhanê Stenbol e.

Di vî pirtûkê de çar beşên bingehîn hene: Koçberiya kurdan ya bo Stenbolê (1453-1925), navenda modern ya nasyonalîzma kurd Stenbol, jinên kurd li Stenbolê, Cemiyeta Hemalên Kurd li Stenbolê.

Çawa em dibînin piştî fetihkirina Stenbolê kurd sîrgûnî Stenbolê dibin û li vir 3 gundên kurdan tên avakirin: Danişmendli, Tepeviran, Işıklı. Di van gundan de bi qasî 382 kurd dimînin. Mamosteyê Fatih Sultan Mehmed Molla Goranî bi xwe kurd bû. Bi kurtî ji sala 1453'an vir de heta sala 1925'an de kurdan her tim koçî Stenbolê kirine. Di van her çar beşan de zaniyarî û agahdariyên dîrokî der heqê kurdên Stenbolê de tên pêşkêşkirin.

Li aliyê din bi qasî 50 wêneyên li ser jiyana kurdên Stenbola kevn di vî pirtûkê de cih girtine.

HEVPEYVÎN: MAZLUM DOĞAN



Xelatgirên pêşbaziya kurteçîrokan a NÇM diyar bûn:

“Ne bo dil in lê hevî didin”

Beşa Sînemayê ya Navenda Çanda Mezopotamyayê encama “Duyemîn a Pêşbaziya Kurteçîrokan” ragihand. Li gorî baweriya endamên jûriya beşa tirkî û kurdî her çend kurteçîrok ji aliyê naverokê û wêjeyî ve zêde ne têr û xurt bin jî, bo pêşerojê hevîyê didin mirov. Her wiha li ser kurteçîrokên bi kurdî jî hate gotin ku mantiqê tirkî serdest e.

Gelek nîrx û rastiye kurdan piştî têkoşîna Teverga Azadîxwaz vedijin. Ji rojnamegeriya kurdî heta televîzyonê, ji berhemên kurdî yê polîtîk heta helbest û kurteçîrokan. Dema mirov li serpêhatiya neteweyên din temaşe dike, pêşbaziye berhemên wêjeyî ji bo netewebûna gelan bi rolên girîng rabûne. Pêşbaziye bi vî rengî hem berê nivîskaran didin zimanê neteweyî û hem jî dihêlin ku nîşên nû û şarêza peyda bibin. Her wiha hevgirtin û dilgermiya ku bi van pêşbaziyan pêk tê, yekîtiya neteweyî ya gelan xurt û pihêtir dike. Di nava van pêşbaziyan de cihê kurteçîrokan girîng û bikêrtir e. Lewre li cihanê bîngeha wêjeyêke tîrnawerok pêşin bi kurteçîrokan tê danîn. Gelek nivîskarên navdar û serketî pêşin bi kurteçîrokan li karê xwe germ bûne peyre ji roman û berhemên heja afirandine.

Li ser vî bîngehê sazîyên kurdan jî ji bo xebat û çalakîyên bi vî rengî dikevin nav tevgerê. Wekî tê zanîn Beşa Sînemayê ya Navenda Çanda Mezopotamyayê “Pêşbaziya Kurteçîrokan” a duyemîn li dar xist. Encama vî pêşbaziye hate ragihandin. Bi pey agahiyên sazûmankarên pêşbaziye îsal ji bo beşa tirkî 76, ji bo beşa kurdî de jî 25 çîrok hatine şandin. Şahiya xelatdayîna kurteçîrokan wê di 11 meha kewçêrê de li Stenbolê li Martî Sanat Evî li dar bikeve. Lê xuya ye ji ber ku gelek kesên ku bo pêşbaziye kurteçîrok şandine û yê xelat wergerîne di girtîgehê de ne, dê beşdarî bo dil pêk neyê.

Derheqê çîrokan de me xwest ji hêla wejeyî, rastnivîsî û serpêhatîyan de dîtinên kesên ku di juriyê de cih standinê

bistinin. Yek ji sazkarên pêşbaziye û endamê Beşa Sînemayê ya NÇM Kazım Öz diyar kir ku wan dil heye vî pêşbaziye wekî kevneşopîyêke bidominin. Lê wî got ku, ew dixwazin êdî pêşbaziya kurteçîrokan Kovara Jiyana Rewşen li dar bixwe, ew dê ya senaryoyan li dar bixin. Her çiqas Kazım Öz ji senaryoyên ku dê werin zêde tiştêkî hevî nake jî, pêşbazî wekî destpêkê hesaband û bo demeke dirêj hevîdariya xwe anî ser zimên.

Kazım Öz ji bo nîrxandina kurteçîrokan jî bal kişand ser girîngiya pêvajoyê û ji aliyê wêjeyî ve kurteçîrok wiha nîrxand: “Kurd di pêvajoyêke dijwar re derbas dibin. Ev ji bo edebiyatê malzemeyên herî bikêrhatî û mezin in. Divê ev bûyer û serpêhatî di warê wêjeyî de jî bîn zimên. Lê mixabin ev yek ji hêla nivîskar ve baş nayên xuyakirin. Çîrokên ku ji girtîgehê tîr bi awayekî berpirsiyarî hatine nivîsandin û hinek jê ji taybetîyên wêjeyî bêpar in.”


Xebatkarê Jiyana Rewşen û endamê lijneya juriyê A.Rahman Çelik jî daxuyand ku ji beşa kurdî re eleqayêke bo dil tune ye. Çelik, wekî mînak jî hejmarî firotina rojname û kovarên kurdî nîşan da. Li gorî gotîna Çelik, wî hevî hebûye ku dê kurteçîrokên tîr naveroktîr bîn şandin lê berhemên ku hatine şandin jî zêde ne qels û lawaz in. A. Rahman Çelik li ser zimanê kurteçîrokan jî serdestbûna mantiqê tirkî berbiçav kir: “Mantiqê tirkî di gelek hevokan de rasterast hatiye bikar anîn. Lê dîsa jî ev berhem pir girîng in. Lewre di pêşerojê de gava bibin pirtûk, wê teqez

bandorê li kurteçîrokên ku bi kurdî bîn nivîsandin, bikin.”

“Kurd êdî li sînemaya xwe jî difikirin”

Endamê lijneya juriyê ya kurteçîrokên bi zimanê tirkî nivîskar û sînemager Ahmet Soner jî kurteçîrok bêhtir ji aliyê senaryoyî ve nîrxand: “Gelo ev kurteçîrok çiqas ji bo filmkirinê bi kêr in? Em bibêjin wê bibin film lê divê li gorî kurteçîrokê film li ser cografyaya wê bê kişandin. Lê wekî diyar e li wê cografyayê şer heye û çêkirina film karêkî dijwar e. Ev berhem bi vî awayî jî mirov hevîdar dikin. Bi awayekî, kurd êdî li sînemaya xwe jî difikirin” Wekî din yek ji endamên jûriya beşa tirkî nivîskara Rojnameya Atılmış Işık Kutlu hin dîtinên cihê-reng anîn ser zimên. Ev çîrokên hatine nivîsandin jî mîna êş, kul, hevî û behcên dilê gelekî nîrxandin û bal kişand ser pewîstiya xeyalê û bikaranîna zimên. Kutlu di dawiyê de wiha got: “Divê kesên beşdarî pêşbaziye dibin, rêzimana zimên baş bizanibin. Her wiha kesên ku ji girtîgehê beşdar bûne piranî rastiya xwe derxistine pêş.”

Dîsa yek ji endamên juriya beşa kurteçîrokên bi tirkî nivîskar Hasan Kıyafet bêhtir li aliyê kurteçîrokan ê hestiyarî koland. Bi baweriya Kıyafet, berhem her çend zêde ne serketî bin jî qêrînen salan tînin zimên “Ez nikarim bêjim kurteçîrok bi serketî ne. Lê ev destpêkek e. Qêrînek di nava



Ahmet Soner


wan çîrokan de hebû, qêrînek ku ev demek dirêj e deng jê derdiket. Em dikarin bêjin çîrok çarlepki ne. Bala min kişand, nivîskaran piranî êş û kedera xwe anîne ser zimên û ji bo demeke dirêj nefikirîne. Her wiha divê hevî û tiştên xweşik ji baş bihatana pêşkêşkirin”.

Di kurteçîrokan de mantiqê tirkî serdest e

Serokê Înstîtuya Kurdî ya li Stenbolê û endamê juriyê Hasan Kaya jî tîrnawerok nebûna kurteçîrokan destnîşan kir û ev nîrxandin kir: “Belê. Li gorî standartên kurteçîrokên dinyayê kurteçîrok ne serketî ne. Lê tiştê baş û girîng jî girtîgehê beşdariyêke mezin heye. Li aliyê din di hemû kurteçîrokan de rastiya ciwakê xwe baş dide der”.

Gerîndeyê Azadiya Welat û endamê jûriya beşa kurdî Samî Tan kurteçîrok pirtir ji aliyê rêziman û rastnivîsa kurdî ve dan ber ronahiyê. Tan jî serdestbûna tesîra fikirîna bi tirkî destnîşan kir û wiha axivî: “Ji ber ku kesên beşdar bûne piranî ji girtîgehê bûn û ji ber ku ev kes zêdetir bi tirkî xwe îfade dikin, wergerê bal kişand. Wekî din xeletiyên rastnivîsî û devokî jî serdest bûn. Gava redaksiyoneke baş li van kurteçîrokan bê kirin û hîn baldarî li ser wan bihata sekinandin, dê ji hêla rêzimanî ve kurteçîrok bêhtir serketî bûna. Her wiha mantiqê tirkî di gelek kurteçîrokan de diyar bû. Wekî mînak di kurteçîrokekê de hevokê wisa hebû: “Xezal li ser diya xwe dilerizî”. Wekî din çarçoweya kurteçîrokê pir hatiye vekirin. Divê piranî li ser bûyereke bihata sekinandin.” Samî Tan di heman katê de bal kişand ser zaravayên kurdî yê din û got diviyabû bi kirdkî (zazakî) û zaravayên din jî berhem bihatana şandin.

ŞEXMÛS SEFER



BERHEMÊN XELATGIR

Di nava kurteçîrokên bi kurdî de Harbi Soylu bi kurteçîroka bi navê “Xezal” di rêza yekemîn de, Dilawer Zeraq bi “Hebên Baranê” di rêza duyemîn de û Talip Kalîn jî bi kurteçîroka “Asê” di rêza sêyemîn de cih girtiye. Di beşa kurdî de H. Kovan Baqî bi kurteçîroka “Mirina Du Serî” xelata taybet a jûriyê wergirt. Li aliyê din di beşa tirkî de Deniz Gö-nüllü bi kuretçîroka bi navê “ Adımlarımı Topluyorum Döndüğüm Yere (Ez Gavên Xwe Hiltînim Bo Warê Ku Lê Vegerim)”, Fesih Demirci bi “ Çünkü Özgürlük Dağlardaydı(Lewre Azadî Li Ser Çîyan Bû) û Mehmet Baranaydın bi “Harman Sonu (Dawiya Bêderê) di rêza duyemîn de cih girtin. Haseri Yumuşak jî bi kurteçîroka “Orada Ölüm Var Uzakta(Li Wir, Li Diyarên Dûr Mirin Heye). Di beşa tirkî de kesên ku xelata taybet a jûri wergirtine ev kes in: Saim Babayigit Bêriya Karikan, Mustafa Sönmez Parola, Turan Demir Gelincikler Acı Çekmez, Eyüphan Başar Çiçek Ana, Uğur Kara Bir Son Gün Öyküsü.

Navenda Çanda Mezopotamya yê ya İzmirê

● 10.10.1998 şemî: Panel: "Netewe û ziman" Amedekar: A.Welat
Beşdar: Samî Tan, Mustafa Borak, A.Rıza Aslan, F. Huseyn Sağnîç

● 11.10.1998 yekşem: Konsera Hozan Cezmî saet:17.00

● 16.10.1998 în: Konsera Koma Agirê Jiyân saet:18.00

NÇM'ya Mêrsînê

● 11.10.1998 yekşem: Koma Sarya, Koma Medya, Mizansen
(Koma Dîlana Şoreşê)

Cî: Navenda HADEP'ê saet:14.00



Navenda Çanda Tohum'ê

● 10.10.98 Şemî: Şanoya zarokan a BEKSAV'ê, saet:15.00

● 11.10.98 Yekşem: Film: Germinal, saet:16.00

● 14.10.98 Çarşem: Filmê 'Posteger', saet: 18.00

● 16.10.98 În: Filmê "Philadelphia", saet:18.30

YÇKM

● 10.10.98 şemî: Filmê 'Eşkiya', saet:16.00

● 11.10.98 yekşem: "Dört Karanfile Merhaba"

Ji NÇM'ê Koma Gulên Xerzan û malbat, saet:16.00

NÇM'ê 8'emîn

Savvegera xwe pîroz kir



Di pîrozkirina salvegera NÇM'ê de zêdeyî 500 kesî beşdarî çalakiya li HADEP'a Bağçîlarê bûn.

Navenda Çanda Mezopotamya yê kete heştaliya xwe. Ji bo salvegera NÇM'ê, xebatkarên NÇM'ê xwestin li salona Labela ku li Osmaniyyê ye salvegera NÇM'ê pîroz bikin, lê dewletê destûr neda. Ji ber vê yekê Navenda Çanda Mezopotamya yê pîrozbahîya heştêmîn salvegera xwe di 3'yê kewçêrê de li HADEP'a Bağçîlarê bi şeveke bi xwarin pîroz kir.

Çalaki bi axaftina vekirinê ya xebatkarê Kovara Jiyana Rewşen Kawa Nemir û Endama Taetra Jiyana Nû Yıldız Gültekin dest pê kir.

Navenda Çanda Mezopotamya yê heta îro li Kurdistan û Tirkiyeyê pênc şax vekirine, ji van şaxan ên li Kurdistanê (Amed û Ruha) ji aliyê dewletê ve hatine morkirin. Çawa ku NÇM'ê li van şaxên wekî İzmir, Mêrsîn, Edene, Amed û Ruhayê li ser çanda kurdan gelek xebatên cur bi cur kirine û nixê hêja derxistine holê, çalakiya pîrozbahîyê jî cihêreng û xweş bû. Pêşkêşvanan di destpêkê de ev tişt anîn zimên: "Me xwest em Salvegera NÇM'ê li Salona Labela yê pîroz bikin, lê dewletê bêyî ku tu mazaretê nîşan bidin destûr nedan ku em şeva xwe li salona Labelayê pîroz bikin. Lê her çi qas ew destûr nedin jî em bi hêza gel, bi xwestina dilê we dîsa li ba hev in."

Di şevê de pêşkêşkirina pêşkêşvanan hem ji aliyê xwerû bi kurdî axaftinê ve, hem jî bi xwendina pêkenokan bala beşdaran kişand û ji serê bernameyê heta dawiyê bi kêf û coş bûn.

Dîsa di şevê de endamê Koma Çiya, Hüseyin İldan axaftineke kurt kir. Di axaftina

xwe de İldan, gotina Ehmedê Xanî ya 'Huner bihega hebûna gel e' bi bîr anî û da zanîn ku ew jî di wê baweriyê de ne, di wê riyê de ne.

Şev bi dîlana Koma Gulên Mezrabotan ku ji zarokan pêk tê dom kir û bi pêşkêşkirina Semaha ji aliyê Koma Serhildan ve coşa şevê zêde bû.

Her wiha xebatkarê rojnameya Azadiya Welat Şexmûs Sefer sê helbestên xwe ku yek jê ji bo Kenan Mak bû pêşkêş kir û Denbêj Cemalê Mihê jî ji herêma Botan çend klam pêşkêş kirin.

Fînalê Şevê Koroya Netewî


Wekî tê zanîn tenê li NÇM ya Stenbolê wekî komên muzîkê Koma Amed, Koma Gulên Xerzan, Koma Rohilhat, Koma Vengê Sodiîr, Koma Çiya, Koma Agirê Jiyân, Hozan Xanemîr û Hozan Mistefa xebatên xwe didomînin. Di şevê de ji van Koman û Hozanan Koroyek hatibû organîzekirin û navê koroyê jî 'Koroya Nete- weyî' hatibû danîn. Vê koroyê konserek da mêvanan û bi stranên xwe ciwan rakirin ser piyan, rengekî taybet da şahiyê û bû finala şevê. Ciwanan ev konsera koroyê bi tezahûratên xwe pêşwazî kirin.

Salvegera 8'emîn a NÇM'ê ji aliyê gelek saziyên wekî Komeleya Jinên Azad, Kovara Özgür Halk, Kovara Jinên Azad, Aram, Ülke de Gündem, Azadiya Welat, Navenda Çanda Emekê ku mesajên xwe şandin û pîroz kirin.

A. WELAT/ STENBOL

TÎŞK

PKDW le Roma bû



BEKİR ŞIWANÎ

Roma, paytextî Îtalya û bêşkey şaristanî hezar saley ser deryay spî nawerast, rojanî 28 û 29'yê mangî rabirdû derwazey sûray mêjûyî şarî bo Perlemanî Kurdistan le Derewey Welat (PKDW) xiste serpişt û mîwandari le perlemantaranî kurd kird. Nûserî em dêrane wekû peyamnêrî MED TV her le seretawe heta kotayî le nizîkewe çawdêrî kobûnewey hawbeşî perlemanî Îtalya û PKDW'î kird.

Mîn namewê lêre da ew şitane dubare bikemewe ke le kenalekanî rageyandinî kurdî û biyanîyewe sebarete be kobûnewey PKDW pexîş kirawe. Belkû demewê pence bixeme ser hendê bîr û boçûnî wîrd ke kamêray hiç peyamnêrêk natwanê tomarî bikat. Hemû beşdaran hestîyan bewe dekird ke perlemantaranî Îtalya dotî gelî kurd zoriyan mebest bû ke kobûnewey hawbeşî ewan û PKDW be baştirîn şêwe bigûzerê û serkewtin be dest bîne. Em helwêstey perlemantaranî Îtaly li zerdexeney ser lêw û geşî çawîyan û hestî berziyan da bedî dekra. Her hereşe û gureşey dewletî tirk hebû hêndey nukî derziyek karî le helwêstî mirûdostaney dostanî Îtalî ême nekîr. Çi le kobûneweke da û çî le danûsanî nêwan êmey rojnamewananî kurd û ewanî perlemantar da, hemîşe deyangût em hengawey ewan le dijî hiç dewletêk niye. Belkû hewlî ewan bo çareser kirdinî kêşey kurd e, ew kêşeyey ke be boçûnî ewan hereşeyekî rastî bo ser hemû Ewrûpa pêk dênê.

Perlemantaranî Îtalya mirovî siyasîn û pêkhatey jiyana siyasî Türkiye zor baş şarezan, boye zor be narezayî û türebûnî dewletî turk sersam nebûn. Herçî hawlatî asayî Îtalya ye le ber ewey le kesêkî dîmokrasi da perwerede bûn herde zehmet bû boyan le helwêstî hêrişkaraney Ankara têbigen. Belam Partî Komonîstî Îtalya berçawî hawlatîyanî rûnak kirdewe û raygeyand ke dewletî turk têdekoşê be qedexekirdinî bestinî kobûnewey PKDW le Roma, perlemanî Îtalya fêrî metod û şewazî antî-dîmokrasi bikat. Be boçûnî ew parte perlemanî tirk westay karamey peyew kirdin şewazî dije dîmokrasi ye û bendkirdinî perlemantaranî DEP be nimûne dênêtewe. Xalêkî tîrî cêgay sernc le bobûnewey hawbeşî perlemantaranî Îtaly û PKDW' da, piştgirî kirdinî perlemantaranî Îtaly bû le şewazî deselatî federalî bo bakurî Kurdistan û pêşniyazeke be germî pêşwazî lêkîra le layen perlamantaranî Kurdewe.

Le rastî da carî yekem e ke rêkxirawêkî Ewrûpî wekû perlemanî Îtalya sipardiwe delên û maratônî çareserkirdinî kêşeke le Romawe dest pê dekat.

Herçende wekû witim eme tenya boçûnêke û hîcî tir, belam çawdêr detwanê bilê em bîrdoze le rastiyeke niziktir e wek le boçûn.

Niştimana min

Amed Paytexta welat
Nêzik bû roja fêlat
Dê azadî û serxwebûnê
Ji me re bike xelat

Gula Welat Ruha ye
Ew giranbuha ye
Çiqas bêjim hêja ye
Bêhna gulên jê dihat


Dilok gelek bi nav e
Derdor çem û delav e
Tak-rihana berav e
Misk û ember lê dihat

Mêzek Kela Mêrdînê
Pir dişibe hêlînê
Xwediyê Ala Skêreng e
Bi xeml û xêza Welat

Şirnex, Sêrt û Êlihê
Şemzînan û Dihê
Xwîna nûjend da rehê
Gula yekem bi lebat

Le Hekarî bûm mêvan
Raneketim bi şevan
Ta ku min dît bi çavan
Roja me ya nû hilat

Min Hewlêr dît li banî
Dihê û Silêmanî
Hawirdor mêrg û kanî
Av dide teyr û nebat



Hilkişiyam Agirî
Bi berfê spîkirî
Sînga xwe li min vekirî
Bi Çiyayê Ararat

Vegeriyam Tatwanê
Rûniştim li eywanê
Min nêrî li Behra Wanê
Pêl pêl ber bi min de hat

Daketim Deştê Mûşê
Dil bû arê li pûşê
Bo zarokên dergûşê
"Lorî! lorî!" deng dihat

Bedlîsa me bend bi bend
Min dîroka wê dixwend
Bi Xecê û Siyabend
Xweş bû Sîpanê Xelat

Çewlîk mij û dûman e
Çile, berf û baran e
Tim bi cenga giran e
Tevlî xumxuma Ferat

Dêrsima min pir rind e
Seyîd Riza di dil de
Wekî Munzur bilind e
Hêlîna kewê ribat

Belê Nemrûd li Semsûr e
Çiya bilind, newal kûr e
Riya min devê şûr e
Ziravtir e ji Sirat

Bajarê rind, Mereş e
Bo azadî dimeşe
Welatê min xweş e
Ji Rojava ta Rojhilat

Dar û ber ên Meletê
Wekî baxê cenetê
Xwediyê ar û rûmetê
Nû danî şêwr û civat

Kela Qersê bilind e
Derdor zozan û gund e
Erzirom çiqas rind e
Bihuştê min e Serhad


Erzingan çi şîn e
Wekî gula bi bîn e
Niştiman pir şêrîn e
Kurdistan, navê Welat

ADAR JIYAN

Ji Amedê

Nameyên


Zarokan



Canan



Çiya Tektağ



Hogir Nûman

Zelal

■ Ez di xebatên Azadiya Welat de serkeftinê dixwazim. Ez neh (9) salî me. Heta ji destê min tê ez ê di xebatên Azadiya Welat de bibim alîkar.

Ez dixwazim ji we re pêkenokekê binivîsim.

– Rojekê zilamek ji gund tê bajêr, kerê wî jî pê re ye. Kerê xwe dibe bi trenê ve girê dide û diçe qehwê çayê vedixwe. Radibe tê mêze dike kerê wî tune ye ji xwe re dibêje: “Kuro lawo! we kerê minî belengazî bir ma we çima trena xelkê pê re bir.”

İdris Canan

■ Ez law im, lawikê kurdî, Nizanim erebî, bi tirkî

Ez dipeyivim bi kurmançî
Natirsim tu carî
Ji caş û Tirkî
Ez keçim keça kurdî
Dikim hewar û gazî
Tu carî xwîn û girî
Welatekî dixwazim bi azadî
Her demê ez dibêjim
Bijî aşî....

Qoser/Mêrdîn

Bahûner

■ Rojbaş, ez Bahûner, ez sêzdeh (13) salî me. Di dibistana navîn de xwendevan im. Ez li NÇM'ya Amedê di koma Zarokên Tavara de dixebitim. Ez ji xebatên Azadiya Welat re serkeftin dixwazim. Ezê ji we re tiştonekekê binivîsim.


“Rojekê Keloğlan diçe berber ku porê xwe kur bike, lê berberxane li wî aliyê avê ye. Wê keloğlan çawa derbasî wî aliyê avê bibe? (porê keloğlan tune ye)

Ji Nûdemê hawara neteweyî

Hejmara nû ya Kovara Nûdemê derket. Ev hejmara kovarê bi pêşeka xwedî û berpîrsê giştî yê kovarê Firat Ceberî dest pê dike. Di vê pêşeka bi sernavê "Hawara neteweyî" de li ser derketina cildên Hawarê tê rawestandî. Di nivîsa navborî de girîngiya Hawarê tê bibîrxistin û pêwîstiya xwedî derketina li weşanên kurdî û belavbûna cildên nûhatî tê zimên.

Di nav rûpelên kovarê de nivîseke ku ji Hawarê hatiye wergirtin jî cih digire. Ev nivîs jî hêla Osman Sebrî ve hatiye nivîsandin. Nivîs bi zimanekî wêjeyî li ser şehîdên Serhildana Şêx Seîd radiweste. Apê Osman di xewna xwe de "Li goristanek Amedê" dibe mêvan.

Nivîsa duyemîn a di vê hejmara Nûdemê de bîranînên Refîq Hilmî ne. Di vê bîranîna ku ji hêla Ziya Avcî ve ji kurmanciya jêrîn bo kurmanciya jorîn hatiye wergerandin de, qala rewşa dewleta Osmanî ya piştî Şêrê Yekemîn ê Cihanê, destpêkirina tevgera kemalîst, têkiliyên kurdan û tirkên ên dîrokî tê kirin. Mirov ji van bîranînan tê derdixwe ku di kîjan mercan de tevgera kemalîst derketiya holê û her wiha tevî hemû dilpakîya kurdan, ew çawa hem di dema Osmanîyan de hem



Kovara Hunerî, Edebi û Çandî

jî di dema komarê de hatine xapandin.

Di nava vê hejmarê de hevpeyvînên bi kesên cihêreng re û li ser mijarên cihêreng balê dikişînin. Mirov dikare hevpeyvîna digel lêkolîner Rohat Alakom wekî mînak nîşan bide. Di hevpeyvînê de li ser pirtûka Alakom a li ser rêxistina Xoybûnê tê rawestandî. Alakom li ser vê rêxistina navborî agahiyên hêja dide. Mînaka duyemîn Bi

Ebdilmecît Şêxo re ye. M. Şêxo bi wergerên xwe hatiye nasîn. Hevpeyvîna ku bi sernavê "Werger kilîteke zêrîn e" derdikeve pêşberî mirov jî, li girîngiya wergerê ye.

Di nava rûpelên vê hejmara Nûdemê de çîrokeke Sidqî Hîrorî ya bi navê "Xewn jî qedexe ne" cih girtiye. Ev çîrok serpehatiya du ciwanên kurd vedibêje ku mirovên dûrî tevgera neteweyî ne, lê ji ber xewnekê ji bi îşkenceya hêzên dagirker jiyana xwe ji dest didin. Nivîseke şayanî bahsê jî "Şîroveya Diwana Melayê Cizîrî" ya Mele Ehmedê Zivîngî ye. Parçeyên ji nivîsa Meleyê Zivîngî ji hêla Emîn Narozi ve ji erebî hatiye wergerandin. Emîn Narozi di pêşeka nivîsê de jînenigariya Mele Ehmedê Zivîngî jî dide.

Ji bilî van nivîsan gelek helbestan di nava rûpelên vê hejmarê de cih girtiye. Helbestên Yılmaz Odabaşı, Hicri Özgören, Hüseyin Elçi, İhsan Fikret Biçici, İbrahim Seydo Aydoğan minakên vê yekê ne. Her wiha Şerefhan Cizîrî, Mihemed Dehsiwar, Şahîne Soreklî wekî gelek hejmarên din ên Nûdemê, di vê hejmara kovarê de jî cih girtine.

SERWÎSA ÇANDÊ


Kaseta nû ya Nilüfer Akbal: Revîngî

Nilüfer Akbal bi kaseteke nû derket pêşberî guhdarên muzîka kurdî. Kaset her çiqas nû derketibe jî, ji bo kesên ku li radyoyên demokrat û MED-TV guhdar û temaşê dikin, piraniya stranên nas in. Di kasetê de deh stran cih digirin, hemû stran bi kurdî ne, hinek jî wan bi kurmançî û hinek jî bi kirdkî ne. Hinek gotin ji hêla Nilüfer Akbal û hunermendên din ve hatine çêkirin, hinek jî gelêrî ne. Gotin û newaya stranên bi kurmançî ji hêla kesên din ve hatine çêkirin. Bo nimûne gotina ku navê xwe daye kasetê, helbesta Kemal Burkay e. Muzîka wê jî Melahat Önalê çêkiriye. Bi taybetî di bilêvkirina stranên kurdî de kêmasî hene.

Di nava kasetê de stranên bi navê "Rabe" û "No çi hal o" balkêş in. Ev her du stran hem bi newaya xwe, hem jî bi nave-roka gotinên xwe dêhn û bala mirov dikişînin ser xwe.


Naveroka hemû stranên li ser kêşeyên neteweyî û civakî yê gelê kurd in. Amûrên ku hatine bikaranîn û awayê bikaranîna deng reneki nûjen dide muzîka kurdî. Tevî kêmasiyên di bilêvkirina zaravayê kurmançî de jî, hebûna stranên bi kurmançî dide zanîn ku hunermend di warê neteweyî de xwediyê helwesteke zelal e.

SERWÎSA ÇANDÊ



Xwediyê kitêba qalikreş û em

HASAN KAYA



Rojek ji rojên germ ên Cizîra Botan bû. Xortekî ku hêj nû simbelên wî derdiketin, li keviya şet diçû û dihat. Çavên wî bi hejîrên ku xwe di ser şetî re berdabûn ketin. Dilê wî pijiya hejîran. Çû ser diwêr û destê xwe dirêjî hejîran kir. Lê ji ber ku hejîrên bi çiqulên nizm ve hatibûn jêkirin, destê wî negîhişte wan. Hinekî din rabû ser pêçiyên xwe. Lingê wî şemitî, çiqulên darê man di nav destê wî de. Bi darê ve daleqayî ma. Û hewar hewara wî.

Di wê navê de, melayê ku bi navê "Xwediyê kitêba qalikreş" tê nasîn di wê derê re derbas bû. Dît ku xortek dike hewar û gazî. Ji xort pîrsî û got: "Te xêr e, çima tu weha bi darê ve daleqayî mayî?" Xortê bê çare got, hal û mesela min ev e. Tu bi xwedêkî min ji vî halî rizgar bike. Dema melê ev gotin bihîstin, got: "De ka deqeyekê raweste ez kitêba xwe vekim, ka

destûr heye ez te ji vî halî rizgar bikim, tune."

Meleyê xwediyê kitêba qalikreş, devê kitêba xwe vekir û bû minemina wî. Dawî li xort zivîrî, got: "Heyf û xebînet, ez nikarim ji te re bibim alîkar." Melê xort di vî halî de hişt, da rê û çû...

Ev meseloka ku ji nav ezmûnên bi sedan salan hatiye dawerivandin, bi qasî desteyek nivîsandinan tiştan bi mirov dide hokirin. Ev meselok ji bo hemû çepgir, rastgir, yê ku xwe xwedî îman dibînin, sosyalîst û komûnîstên ku tu kesî di ser xwe re nabînin, hunermendên ku dibêjin em bêlayan in û ji gelekên din re hatiye diyarî kirin. Ev meselok, mesejê wiha radigihîne van camêrên ku me li jor çêlî wan kir: "Heke welatê we, têkoşerên azadîxwaz ew xortê ku bi dara hejîrê ve maye daleqandî be, hûn jî melayê xwediyê kitêba qalikreş in." Yê ku hinek kirin û dîtînen Teverga Azadiyê ji xwe re wekî hincet dibînin û xwe dûrî têkoşînê dikin, yê ku ji ber kitêba xwe ya qalikreş ber bi yekîtiyê, ber bi yekbûn û yekirina hêz û tevgerê ve nayên bila qet nebêjin cudahiyek heye di navbera me û wî meleyê xêrnexwaz û dilxerab de...

Îro em li van çend rojên dawîn dinêrin, di navbera Tirkiye û Sûriyeyê de nîqaşek heye û dengê defa şer ji dûr ve tê bihîstin. Mijara min ne ew e ku ez şîrove bikim ka şer dê biqewime an na, meqsêda Komara Tirk çi ye ji vê qîreqîr û wîrewîrê. Bi tenê ez dixwazim bibêjim ku îstisna ne tê de, bêje hema hemû sazî, kes, rêxistin, partî komel û hwd. bi yek deng û awazî çîrçîrê dikin û kêra xwe tûj dikin ji bo şer. Dîsa mirov bala xwe didiyê ku cihana ereban, li hemberî vê rewşê nakokiyên di nav xwe de dane aliyekî, mesajên piştgiriya Sûriyeyê radigihînin û moral û cesaretê didine wê.

Ma qey bi tenê bextê me wiha kor e. Hemwelatîyên ku nanê vî welatî xwarine, ava Kurdistanê vexwarine, hewa hênik kişandine cegerên xwe. Yê ku xwe zana, jîr, pîspor, siyasetmedar, sekreter, entel û bîrewer dihesibînin! Careke din destê xwe daynin ser wijdanê xwe. Qet bila hestê xweparastîne bi we re çênebe. Xwe muhakeme bikin, gelo cihê ku a niha hûn lê rawestiyane ji vî gelê şikestî re çiqasî bisûd e. Cihê ku hûn lê rawestiyane çiqasî nêzî gel û welêt e. Ma ev gotina klasîk jî naye bîra me. "Ma qey pozê me naşewite"...

El beyt û beytullah

Li herêmeke Kurdistanê mizgefteke pir mezin hebû û yên ku diçûn mizgeftê xwe sofî dihesiband. Meleyê wan got:

- Dema hûn hatin pêwîst e ku hûn bi xwe re mûman bînin mizgeftê. Wê, pîroziya mala Xwedê zêde bike. Ji bo vê yekê hemû sofîyan mûm dibir mizgeftê. Lê tiştêk divê mizgeftê de dibû, qet di tu mizgeftê de nedibû. Ew mûm ên ku sofîyan dianîn mizgeftê dihatin dizîn, nediman roja din.

Rojekê Sofiyekî ji wan re got:

- Wele wisan çênabe. Ma di mala Xwedê de jî dizî çêdibe? Ka ez ê bi pey vî tiştî bikevim. Belkî ez diz bibînim."

Sofî şevêkê xwe di hundurê mizgeftê de ve-dişere. Di destê wî de darekî dirêj heye. Bû nîvê şevê dît ku hêdîka deriyê mizgeftê kir çirî û vebû. Sofî Evdila kete hundir û bikêf xwe hejand û got:

- El beyt û beytullah. Mal mala xwedê ye. Sofiyê xwe veşartibû dara xwe rakir û got:

- El mûm, mûmûllah, qismetê Sofî Evdillah ev dar û fisebûllah, li ser serê Sofî Evdillah. Darê xwe serê sofî de kir xwarê û sofiyê diz dît.



Remo û Xemo

Remo ji Xemo re got:

- Diya te çend mêr kirine? Xemo serê xwe berda ber xwe û ponijî.

Remo jê re got:

- Xemo bi xwedê gundî hemû dizanin, vêca serê xwe rake û bêje, fibê neke.

Xemo got:

- Bi serê şêx ez nizanim, qey gundi bi tîzbiyan dihejmêrin.

Ez jina kê bûm

Helê heft mêr kiribûn. Rojekê çî Stililê, mala Apê Mûsa. Apê Mûsa jê re got: Helê, keçê tu çî çilmisî yî. Beriya çend salan tu çî sipehî bûy? Qey nayê bîra te roja govenda mala Huso te xwe çitîkî li erdê dixistin, tu wekî karek xezalan bûyî.

Helê keserek kûr berda û got:

- Kekê Mûsa, qurbano wê çaxê ez jina kê bûm?

Ji PIRTÛKA ABBAS ÎSMAIL-

QAŞIMLO.

BI NAVÊ "ÇÎROK Û ÇÎVANOK"

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (141)

XAÇEPIRSA

Şevêkê...	A	B	C	D	E	F	G	H	I	J	K	L	M	N	O	P	Q	R	S	T	U	V	W	X	Y	Z
...

Rojname gerek (wêne) Diyarî	Evindara insên Rifoşkarê ronamê	Sembola Flor İhtilalî	2	Ne giran	Sembola aktinyûmê Amûrê Cotkirinê	Bi herêmi roja ku em tê de ne
Reber, serêk ... û şapik			Exlaqî Şixul	Cinavkek Kesê ji botanî	Kinivisa Emerika	
Kinivisa navdar Bi tirkî lihevdistin	Paşeroj Bi devokî mû	Xwarina bi banqlî Bi kirdkî çû			3	Tîpa pîncemîn Sembola Kûkûrt
Dengdarê n Zik	Welatekî cîran			Xwedayek	Amûrekî çandiniyê	
Pûşî	Zû				Not	
1						
Bi tirkî hilberîne						
Rojek						
	5	Pir				Tîpa du D'yê

Bersiva Xaçepirsa 139'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihêjin destê me, em dê wan binirxînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmarê me ya 141'ê Kaseta Nilüfer Akbal 'Revingî' ye

Jêrenot:

Ji bo ku bersiva we bê nirxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata hejmarê 139'an Încîla "Yuhanna" qezenc kirine ev in: Eylem Yalçınkaya/Edene, Yahya Erzi/ Semsûr, Enise Süer/Mêrsîn. Mirza Sağat/ Edene, Faruk Yönlü/ Wan

PEYVA VEŞARÎ

1 2 3 4 5

Tehdîtkerdinê Demirelî peyra vînayinê dewletanê Rojhilatê Miyanî:

“Kay û dolabê îsraîl”

Ewro seyana dîplomat û sîyasetkarê kurdanê heme cayê dinyay de rastîna mesela kurdanê silasnayin û destegê dinyay wazenê. Noyo jî dostanê şarê kurd keno vêşî û ê dewleta tirk jî keno kemî. Vêşîbiyayinê dostano jî zûranê dewleta tirk vetina werte. Naye ra piya jî raya siyasîbiyayin abeno û mesela kurd beno navneteweyî. Pêhetek amayinê serdaranê dewletan de mesela kurdan yena rojev û cawo gird gena



Tanqê dewleta tirkê hetê sînorê Sûriyê wa şinê

Wêramayinê Talabanî û Barzanî dewleta tirk zaf tarsaynê û hêrsê kerd, hewna no tars û hêrsê ci nêravêrdi ke, no fin pêseramayinê PKDW'ê parlamentoya İtalya vejîya werte û mesela kurdan rojewê Ewropa û Tirkîye de cawo giran girot. Hemû qîsey û vatenî kurdan û mesela kurdan ser ro vajîyay. Coka jî tarso gird kewt serdaranê dewleta tirk pîze ke, mesela kurdana bena mesela siyasî. Mesele ke bî siyasî, bena mesela navneteweyî (uluslararası). Xora çîyo ke dewleta tirk tarsayneno jî no yo.

Çimki awa wazena mesela kurd tim û tim, her ca zey mesela terorî bêro silasnayin ke kes destegê xo medo kurdan. Coka serdarê dewleta tirk her fekê xo akerdin de mesela kurd inkar kenê û mesele zey mesela terorî danê silasnayin. Serdaranê dewleta tirk, hetanî nika na mesele de heveyê bo jî serkewtin vist xo dest. La belê ewro ra tepya destvîstinê serkewtin mimkûn nêayseno.

Serkewtinê diplomatîtanê kurdan

Çimki ewro seyana dîplomat û sîyasetkarê kurdanê heme cayê dinyay de rastîna mesela kurdanê silasnayin û destegê dewletan û şarê dinyay wazenê. Xebato winaynîno dostanê şarê kurd ke-

no vêşî û ê dewleta tirk jî keno kemî. Vêşîbiyayinê dostano jî zûranê dewleta tirk vejeno werte. Naye ra piya jî raya siyasîbiyayina mesela kurdan akeno û mesele keno mesela navneteweyî.

Hinî ewro mesela kurd biya mesela navneteweyî. Kamîn serokwezîr û serokdewlet kamîn serokwezîr û serokdewlet yeno pêhetek, mesela kurdana yena rojev û cawo gird gena. İste qayîlnebiyayinê dewleta tirk, tiya vejîyeno werte. Senî ke dî mesela kurd bî mesela navneteweyî, hema destê xo eş (çekard) tehdîtkerdinê Suriye.

Serokomarê dewleta tirk Süleyman Demirelî abiyayina parlamentoya xo de dewleta Suriye tehdît kerd. Demirelî zey sebebê şero lîmino ke 15 serî yo Kurdistan de devam keno, dewleta Suriye musnê û idia kerd ke Serokê PKK Abdullah Öcalan o jî Suriye de maneno. Ancî ey wast ke dewleta Suriye PKK rê hetkarin virado û Serokê PKK Abdullah Öcalanî jî, teslîmê ci kiro. Xora se bi jî, niwa tepya bî. Kamîn serdarê dewlet fekê xo akerd, Suriye tehdît kerd. Heta nê tehdîtkerdenana jî nêmendî nezdiyê sînorê Suriye eskeran û hacetanê şeriya kerdî pir û goreyê vatena serdaranê dewlet tirk îyê nezdî de sînorê Suriye de tatbîkatê eskerî virazê.

Dewleta tirk her çiqas sebebê tehdît-

kerdin PKK û serokê ci Öcalan bahne musna jî, serdaranê dewletanê Rojhilatê Miyanî û sîyasetkaran reaksiyono tuj mûsna tehdîtkerdinê Tirkîye û tehdîtkerdin kay û dolabê İsrail hesibna û pêrin wast, wa Tirkîye û Suriye meselelanê xo, raya dîplomasiya çareser kirê. Ancî înan vat ke, eki Tirkîye vardayin virazo, mayê Suriye het ca bigimi.

Ma ke ewnayimi nê vatenanê serdaranê dewletanê Rojhilata Miyanî û biyayinê ke heftewo verîn Ewropa de vejîyay werte, bêçaremendin û tenyamenîndinê serdaranê Tirkîye verî ra rind vînemî. Serdarê dewleta tirk winî kewtê jew hal ke, gama xo çekirê kamîn kişt û çiçi biyarê zîwan, ma kurdê qezenkar vejîyemi. Çimki her ca mesela maya vejîyena serdaranê dewleta tirk ver û mesala maya jî her ca înan bêçare ternena û eki goşê xo medê veng û haqanê ma, îyê ewro ra bêter bê. Tehdîtkerdina, sebebê şerî zewbî kes mûsnayina, rastîna şerî nêraceniyena û teva jî nêkewno kesî dest. Xo her cayan bombe bike, dewan biveşini, cenî, camêrd, geç û qul mevajî bikişî û peyra vejîye sebeb Suriye bîmûsne û biwaze ke dinyay bixapeyni. Çi heyf o kesê ke bixapiyniyê nêmendê. Şima herey mendê.

MEMED DREWŞ

Murat Bozlak Stenbol de bî

Serokê Giştî yê HADEP'î Murat Bozlak dimay hewt aşmî ke girotxane de derbas kerd, rojo çarê rezberî de Stenbol de bî.

Rojo çarê rezberî mardim eşkeno vajo reya jüyemîne bî ke Stenbolî konvoyekew ana zahf dî. Di saat: 11'ê rojî de trafikê Stenbolî bî erebeyanê HADEP'ijana bî pirê.

Di miyanberê 700 û 1000 hebî erebey ameybî pêser û Murat Bozlak balafirgeh ra girot, berd heta verê HADEP'ê Bağcılarî.

Di verê HADEP'ê Bağcılarî de Serokê Giştî yê HADEP'î Murat Bozlakî vatinêke kerd. Bozlakî bal ant ser adirbirnayinê PKK'î û wina vat:

“Jüyê rezberî de jû het bo jî teqnyayinê tîfingana ame vindertin. Heto bîn ro operasyonê devam kenê. Gerek çekî vinderê û demê diyalogî dest pê bike-ro. Wa diyalogî dest pê bikero ke 62 milyon insanî têdir bijîyo.

Ê ke Enqera de wê veng nêsono înan. La aşî waştîşê ma heminan o. Ma hendî nêwazenê insanî keder bancê, dewî biveyşê, failî meçhûlî vîraziyê. Wa jû kes nêterso ke dewlete bibo dicay. Jû dewlete nêkeno dicay û fikrê jüy qeybî dicaybûne jî çiniyo. Ma wazenê şarî hendî zey aştiyane têdir bijîyê. E ke enî şerî nivindarnê jî HADEP bêro îktîdar ke enî şerî vindarno û aşî biyaro.”

Bozlak ser galagaley Tirkîyaw û Suriye de jî vindert û wina vat: “Ma nêwazenê ti ca şer bibo. Ger pirs-girêkê Tirkîya, Suriye dir esto, enî bi awaykew diyalogî çareser bikero.”

Serokê Giştî yê HADEP'î peynî xeberdanê xo de ana vat: “Ma wazenê Tirkîya bi aşî biko 75 seriya xo. Gerrek insanî bi aşî bijîyê. Kurdê ke di varoşanê Stenbolî de jiyenê ma bişirawê dewanê cînan. Gere OHAL û Cerdevanî bêre wedartin.”

Serokê Giştî yê HADEP'î da zanayin ke o yo 10'ê aşme de di İzmir, 11'ê aşme de di Wan û 18'ê aşme de jî ke Amed de bo û ewca startê hilbîjartinî bido.

C.ANDOK/STENBOL

WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Xwedî (İmtiyaz Sahibi)
M. NURİ KARAKOYUN

■ Yönetim Yeri:
İstiklal cad. Asmalı Mescit sok. 35/37 No:308

Beyoğlu/İstanbul
TEL: (0 212)
251 79 37
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Giştî yê Weşanê
(Genel Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN
■ Berpîrsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık A.Ş.
■ Yayın Koordinasyon:
Gündem Basın ve Yayıncılık San. Tic. Ltd. Şti.

■ BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım

■ NÜNERİTİYEN ME
(Temsilciliklerimiz)
■ Amed:
Tel: 0 (412) 223 34 83

■ Mersin
Tel: 0 (324) 233 83 96
■ İzmir
Tel: 0 (232) 425 37 02
München:

(Nünerê Giştî yê Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815
■ Swisre:

İhsan Kurt
Tel-Fax
41 21 652 76 07
■ Hollanda:
S. A. Fewzi
Tel-Fax: 31 10 48 555 43
■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yüsiw

Piştî têkoşînê daxwaza parsekên Licê: Bila Xwedê Serok biparêze

Mirtibên Licê gava dihatin gundan tiştekan ji malan dixwest, êdî nedigotin: "Ji bo Xwedê, Xwedê we biparêze, Xwedê îmanê bide we nanek nan, an tiştekan bidin me." Wan êdî digotin: "Xwedê we rizgar bike, Xwedê Serok Apo li serê we kêmaneke, hûn Kurdistanê azad bibînin".

Lice, kengê û çawa kete rojeva Tirkiye û Kurdistanê? Li Licê çi bûyer qewimîn? Bi naskirina têkoşînê re di jiyana Liceyîyan de çi guherîn çêbûn? Têkoşînê çi bandor li guherîna di warê aborî, çandî û wêjeyî de kir? Lice çima hate şewitandin? Di salvegera şewitandina Licê de em karin li ser van pirsan jiyana Licê ya berê, ya îro û dema şewatê bi bir bixin û li ser bisekinin.

Licê bi taybetî cara yekem di 1975'an de di dema erdhejê de kete rojeva Tirkiye û Kurdistanê. Di wê erdhejê de zêdeyî du hezar kesî jiyana xwe ji dest da. Li ser wê erdhejê li gundan hinek kesên ku ji xwe re digot oldar, wiha digot: "Gelê Licê yê ku di nava qezayê de diji Iraq vedixwar loma Xwedê ev yek anî serê wan." Lê li gorî zanariyê em zanin çima erdhej pêk tê.

Tovê azadiyê li Licê tê avêtin

Di ser erdhejê re demeke dirêj derbas nebû, gelên Kurdistan û Tirkiyê bi bûyereke dinê Licê nas kir. Dem, 27'ê sermaweza 1978'yî bû. Li gundê Licê, Fîsê Serokê PKK'ê û hevalên wî di mala Seyfettin Zoğurlu de li hev kom bûn û PKK hate avakirin. Bi avakirina PKK'ê re herkesê, Licê nîqaş dikir. Ji wê rojê û pê de êdî di dîroka kurdan û dagirkeran de Licê cihê xwe yê taybet girt. Gava dagirkeran dest bi şewitandina Licê kir di sa behsa wê demê dikir û ew dem wekî sedem nîşan dida.

Licê di pir waran de balkêş bû û di rojevê de deng vedida. Berî 1980'yî mirov dikare bibêje ku li nava Licê di her malekê de partiyekek hebû. Her endamê malê dilxwazê partiyeke kurdan bû. Ger çar bira di malekê de hebûna ji wan her yekî partiyeke diparast ango mirov dikare bibêje li her malekê çar partî hebûn. Ji bilî vê, berî derketina wan partiyên wê demê, gelek Liceyî dilxwazê Mele Mistefa Berzanî bûn. Ji bilî wan Lice bi qaçaçîtiyê jî dihat naskirin. Berî 1980'yî rewşa Licê wisa bû. Piştî 1980'yî di rewşa Liceyîyan de çi guherî? Li dî 1980'yî Liceyîyan wekî ku erdhejê bandor lê nekiribe, di cih de xaniyên xwe avakirin, lê îcar ne li Serê Gir, hinekî li jêr, di rastê de ava kirin û dest bi jiyana xwe ya rojane kirin. Di jiyana Licê de tiştên cihêreng, kesên cihêreng hebûn. Dema berî 1990'î li navçeya Licê di her

warî de cihêrengî hebû. Mirov kare bibêje ku mirovên li navenda Licê rûdiniştin debara xwe bi esnafiyê dikir. Yên ku di karê dewletê de karmendî dikir, yê ku xwedî dikan, xwaringeh, ên ku bazirganî, hêdî dikir û hwd.

Li Licê berê gelek ermen hebûne, lê niha hejmara wan gelekî kêman bûye. Berê hêdî hebû, di nava Licê û gundan wê de pir navdar bû. Navê wî Pên

avêtin, bandora xwe li ser Licê jî kir. Piştî guleya yekemîn li Licê jî her tişt guherî. Bi 1990'î re li Licê her tişt ser û bino bû. Êdî gelê Licê wekî dagirker tevnedigeriya. Dagirker êdî nedikarî Liceyîyan bike wek xwe û hêdî hêdî li Licê desthilatdariya gel dihat danîn.

Piştî van rûdanan dagirkeran pêşî tabûra leşkeran xurt kir, hejmara leşkerên xwe zêde kir. Ev jî ji wan re ne bes bû,

dê xwe bi rengên xwe yê neteweyî dixemilandin û beşdarbûna bi hezaran kesan defîn dikir. Mirtibên Licê êdî gava dihatin gundan tiştekan ji malan dixwestin nedigot: "Ji bo Xwedê, Xwedê we biparêze, Xwedê îmanê bide we nanek nan, an tiştekan bidin me", êdî digot: "Xwedê we rizgar bike, Xwedê Serok Apo li serê we kêmaneke, hûn Kurdistanê azad bibînin û hwd". Licê hate wê radeyê ku

êdî dagirker ji bo Licê baş nedifîkiriya. Jixwe Liceyîyan jî dagirker li ser axa xwe nedipejirand. Ma dagirker Licê wisa dihêlin? Lê ji bo şewitandinê divê tiştekan wekî hincet nîşan bidana. Roj 22'ê rezberê, sal 1993'ê bû. Niştecihê Licê wekî her gav ji xew rabûn ku biçin karê xwe. Zarokên diçûn dibistanê lez dikirin ku bi gihîjin dibistanê. Karmendan dest bi kar kir. Zarok gihîştin dibistanan û dest bi perwerdehiya xwe kir. Roj hê nehatibû nivroyê. Serbazên dewletê hatin, zarokên xwe ji dibistanê birin. Ev rewş nîşaneyê tiştekan baş nîn bû. Di ser vê rewşê re zêde dem derbas nebû. Pêşî dengê guleyekê hat. Kesî fêman nekir ka çi ye. Dûre dengê çekan zêde bû. Bi dengê çekan re dengê nalîna zarokan, jin û mêran û bi ser de jî dengê firokeyan... Lice di nav duman û girînan de ma. Firokan bi taybetî mal gule-



bû. Pên bi xwe mirovekî ermenî bû. Ji gundan, gundî dihatin ker û hespên xwe nel dikirin, ji xwe re li cem wî das, vastrû, bivir û tiştên hesinî çêdikirin. Debara wî zîlamî li ser hêdîyê bû. Her çiqas ew ermenî û Liceyî misilman bin jî kes jê aciz nebû.

Gundiyan tiştên xwe yê firotanê di anîn di Licê de difirotin. Bi taybetî gundiyan Cinezûr tirî, Dêrxustîyan êzing di anîn li navçeyê difirotin. Bi wan peryan jî ji navçê pêdiviyên xwe distandin û vedigariyan gundan xwe. Di Licê de dadgeh hatibû wê astê ku ji navçeya Qulpê jî dihatin dadgeha Licê karê xwe jê derbas dikirin. Di sa li navçeyê jiyana civakî jî gelekî cihêreng bû. Dawetên Liceyîyan bi awayekî geş derbas dibûn. Di dawetan de mirtiban li zirnê û defê dixist û gel jî li ber radibûn dîlanê. Li Licê dibistana seretayî, a navîn û lîse hebûn. Ji xeynî wan dibistana mecanî (yaxîlî or taokul) hebû.

Lê çi çax ku guleya yekemîn hate

leşkerên xwe di dibistana mecanî de bi cî kirin. Dibistan bi leşkerên xwe wekî Kurdistanê dagir kir.

Dadgeh hilkişîyan çiyê

Bi 1991-92' an re êdî di Licê de tiştekan ku dewletê li ser piyan bigire tunebû. Dadgeha dewletê êdî bi kar nedihat. Gel êdî pirsgirêkên xwe nedibirin dadgehên dewletê, diçû cem şervanên xwe, pirsgirêkên xwe çareser dikir. Serdozgerên dewletê êdî di korîdorên dadgehê de pêgermok digeranandin. Dibistan êdî bi kar nedihat. Gelê Licê êdî bi her awayî piştgirê şervanên xwe bû. Roj bi roj xort û keç tevli refan dibûn. Coşa gel her roj zêde dibû. Gel dîlanên xwe êdî bi rengên kesk, sor û zer dixemilandin. Berê dayikan ji zarokên xwe re lorik digotin lê êdî li şûna lorikan behsa lehengiya şervanan dibû. Her çalakiyeke şervanan bi kêfeke xweş dihat vegotin. Her çalakî bi lez û bez diket nav dilê gel, pêl bi pêl li nava gel belav dibû. Gel her şehî-

baran dikirin. Di dawiyê de zêdeyî 200 dukan ku her dikanek bi pereyê wê demê bi milyaran mal tê de hebû, şewitîn. Zêdeyî sî kesî jiyana xwe ji dest da. (Hinek ji bo kuştîyan qala 100 kesî dikin)

Çima Licê? Jixwe dagirkeran dest bi şewitandina gundan kiribû. Licê bi taybetî hilbijart. Ji ber ku dagirkeran digot: "Vê berxwedanê li Licê dest pê kir, wê li Licê bi dawî bibe." Li hemberî wan gotinan di salvegera şewitandina Licê de tê dîtin ku berxwedanê li Licê dest pê kir, li Licê û her derê didome. Li Licê berî şewatê deh hezar kes dijiyan, niha du hezar kes bi zor hene. Berî şewitandinê nexweşxanekê bi kêman be jî hinek xebat dikirin niha ew jî êdî bi kêmanayê. Karmendên dewletê, meleyên mizgeftan û hwd berê li Licê rûdiniştin, niha jixwe hejmara wan ji sisiyan yek maye, ên ku mane jî di nava Amedê de rûdinin, serê sibê erebê siwar dibin tîna Licê, êvarê di sa vedigerin Amedê.